welat

Sal:1 Hejmar:21 12-18 Tîrmeh 1992 3000TL(KDVD) Rojnameya Hefteyî

## Gelê Tirk jî ordiyê naxwaze!

Di 5'ê Tîrmeh'a 1992 an de li bajarê Kırklareli 6 serbazên (Astsubay) artêşa Tirk araq vexwarin, serxweş bûn û bela xwe li keçikên 16, 17 salî dan, dûre jî li wan û bavê wan xistin.

Xelkê Kırklareli ev bûyer protesto kirin û nêzîkî 3000 kes heta ber qonaxa ordiyê meşiyan û dirûşme (slogan) li dijî leşkeran avêtin. Ji ber vê yekê ji orduevî sîlah berî xelkê dan. Sê kes birîndar bûn. Li nexweşxanê fatereşka birîndarekî birrîn.

Wezîrê Hundir İsmet Sezgin di derheqê vê bûyerê de ji rojnamevanan re ev beyan kir: "Ev dewlet, dewleta hiqûqê ye, wê ev bûyer jî di nav sînorên hiqûqê de çareser bibe!"

Serdozgerê Komarê di derheqê van serbazan de pirseke adlî vekir. Di dawiyê de ev serbaz 28 roj ceza xwarin.

# Bêdengî şirîkatiya sûc e



**Tenûra min çima bê dar û arî / Berê sorbûy çima îro tu sarî? / Ciwan bûm ez sivik min nan dipêja / Çiqas xweş bûn bi germî û bi sarî** *J. DOST*

Li gundên Kurdistanê, tu malekê bê tenûr nabînî, ew tenûr, jinên Kurd bi destê xwe çêdikin. Axa sor û mûyê bizina tev li avê dikin, weke hevîrekî çêdibe, dawiyê, qor li qorê datînin û tenûrê dighînin serî, çend rojan, ew tenûr li ber şewqa rojê dimîne heta ku dibe wek qermîdê. Roja pêşî, ku agir di tenûrê de dadin û nan lêdixin dibe weke dîlanê, wî nanî li gundiyan belav dikin. Dîtina tenûran, ji alî arkeologan, li xerabe û kavilan jî, îsbateke ku li wê derê Kurd hebûn. Lê mixabin, hêdî hêdî nanê fronê, pêşiyê li nanê tenûrê digre, tenûr, folkoloreke Kurdî ye divê em li vegerin.

- **Qatilê Wedat Aydin herkes dizane. Di hejmara me ya derbas bû de, navê duduyan heye: Polîsên Emniyeta Amedê Durdu û Metin. Rêvebirên dewletê bêdeng dimînin. Bêdengî, qebûlkirina qetlîam û cinayetan e.**
- **Komele û sazgehên demokratîk jî li ser qetlîam û terora dewletê a li Kurdistanê ranawestin. Çapemeniya Tirk, çavê xwe ji Kurdistanê re girtiye, bûye wasiteke şerê taybetî. Bêdengî şirîkatiya sûc e.** *Rûpel 15*

*Êrîşên gerîla zêde dibin*

## Şerê psîkolojîk jî îflas dike

Êrîşên gerîla roj bi roj xurttir û tundtir dibin. Rojê çend qereqol tên hilweşandin û hejmara kuştiyên hezên dewletê û cerdevanan çend qat dibin. Çapemeniya Tirk weke hercar, ji van bûyeran tu tişt nanivîse, belê li ser maseyên xwe bûyeran diafirînin. Di van bûyeran de, hejmara kuştiyên PKK'ê tu car nakeve bin pêncî an jî şêst kesî. Lê ev dewleta ku cendekên gundiyên bê sûc û bê guneh jî di televîzyonên xwe de teşhîr dike û dibêje me evqas "terorîst" kuştin, nikare yek ji van cendekên 50-60 kesî nîşan bide. Şer dora xwe fireh dike, herêmên ku heta doh têkiliyên xwe ji her tiştî qut kiribûn, îro di nav şerekî germ de ne, jiyana xwe diguhêrin, *Rûpel 15*

## Dewlet bela xwe ji HEP'ê venake

- **Dewlet, ji aliyekî ve dixwaze Partiyê Demokratîk bi riya dadgehê bide girtin lê, ji aliyekî din ve Partiyên Demokratîkên nû tên vekirin û di nav xwe de yekîtiyê çêdikin.**

Serdozdariya Komarî ya Darazdaniyê (Yargıtay Cumhuriyet Başsavcılığı) ji bo girtina HEP'ê di 3'yê meha Tîrmehê de, li Dadgeha Qanûnê Esasî dawe vekir.

Dadgeha qanûnê esasî dest bi lêkolîna vê dozê kir. Dadgeh ji bo ku HEP xwe mudafa bike du meh muhlet dayê. Li gor madeyên 2, 3, 4,14, 66 û 69. ên qanûna esasî û madeyên 78, 80, 81 û 103. ên qanûna Partiyên siyasî girtina HEP'ê tê daxwaz kirin.

Naveroka van madeyên qanûna esasî *Rûpel 15*


- **'Kelemê çavê dijmin'** Felat Dilgeş *Rûpel 3*
- **Riya şerê psîkolojîk girtî ye** R. Cîzre *Rûpel 3*
- **Romanya; welatekî bêxwedî** Dilbixwîn *Rûpel 4*
- **Alınak gazî mebûsên Kurd dike** *Rûpel 5*
- **Mehkemekirina dîtin û ramanê qebûl nakim** İsmail Beşikçi *Rûpel 5*
- **Awireke dîrokî li ser Zazayan** Maruf Yılmaz *Rûpel 10*
- **Rastnivîsandina zimên** Huseyîn Denîz *Rûpel 12*
- **Piremêrd î nemîr** Mehabat Kurdî *Rûpel 13*


*Cerdevan bi devê xwe îtîraf kir:*

## 'Emrê kuştinê min da'

Rêvebir û berpirsiyarên dewletê di her daxuyaniyên xwe de behsa hebûna demokrasiyê û otorîteya hiqûqê dikin. Lê bikin nekin jî ev rastî nayê guhertin. Ji ber ku bi temamê saziyên xwe ve di bin emrê otorîteya leşkerî de ne. Roj bi roj bûyerên ku derdikevin holê vê rastiyê nîşan didin.

Berî du mehan, di 20'ê Nîsana 1992 an de li ser riya Midyadê *Rûpel 15*

## Terora dewletê li ser Kurdên metropolê

Di van rojên dawî de dewlet li metropolê jî, li ser Kurdan şerekî psîkolojîk dide meşandin, dewlet li bajarên ku Kurd lê dijîn weke Îzmîrê, di navbera gelê Kurd û Tirk de tovê neyartiyê diçîne û wan berdide hev. Armanca dewletê ew e ku bajarê metropolê ji Kurdan bide şûştin û wan bide koç kirin. Dewlet di hêla aborî de dixwaze ku Kurdan neçar û reben bihêle, lingê wan têxe soleke teng û bê bawer bike.

Ji demek dirêj ve hêzên tarî belavokan li bajarê Îzmîrê belav dikin, di belavokên xwe de ji gelê Tirk re wisa dibêjin: "Xaniyan bi deman nedine Kurdan, Kurdan di kar û şuxlên xwe de nedine xebat kirin, tiştan nefiroşin wan. *Rûpel 15*

## ROJEVA WELÊT

### Kurm ketine qurmê darê

Dema qurmê darê tije kurm bû û petiya, êdî îflah nabe.

Her çiqas hûn şaxên wê îlaç bikin, avê lê bikin û wê bi naylonan biparêzin û binixêmin jî dîsa ne çare ye. Şax û perrên wê bi saya av û îlac û naylonan, ji bo demeke kurt geş bibin jî, jî nişka ve wê dar ji qurm ve bişkê û şax û perrên wê bikevin nav dest û piyan û hişk bibin.

Îro dewleta Tirk bûye wek vê dara kurmî.

*Rûpel 15*

# REWŞ



**Abdullah Keskin**

## Bêdengî û mesûliyet

Wezîrê Karê Hundir İsmet Sezgin, digot: "Heçî dibêje kontrgerîla heye bila şanî me bide"

Bi baweriya me İsmet Sezgin, ji herkesî bêtir cih û navnîşana kontrgerîla nasdike. Li her bajarî navendê (merkezê) kontrgerîla, avahiyên emniyetê ne. Mirovahî di wan deran de, di nav çerxên îşkencê de winda dibe. İsmet Sezgin jî mesul e.

Heta kengê wê karibin ji rastî û mesuliyeta qetlîaman birevin? Di hejmara derbasbûyi de me navên 2 qatilên Wedat Aydin nivîsîn. Metin(Hêvî) û Durdu, herdu jî polîsên Emniyeta Diyarbekirê ên siyasî ne. Plaka eraba wan bellî ye, ew jî ereba emniyetê ye. Midûrê Emniyeta Diyarbekirê Ramazan Er û Waliyê Rêveberiya Taybetî yê wê demê Hayri Kozakçıoğlu, ji herkesî bêtir van polîsan nas dikin. Ji mirovên welatparêz û demokrat pê ve deng ji tu kesî ne hat. Parlamenterê Şirnexê Mahmut Alınak wê li dema pêşiya me, pêşniyarekê bide meclîse.

**ROJNAMEYA SABAH**

Hefteya çûyî me îlana Welat ya hejmara 20'an ji bo rojnameya Sabah hazir kir. Qebûl nekirin. Tu sebeba wan a aqlî tune bû. Ditirsin.

***Bi baweriya me İsmet Sezgin, ji herkesî bêtir cih û navnîşana kontrgerîla nasdike. Li her bajarî navendê (merkezê) kontrgerîla, avahiyên emniyetê ne. Mirovahî di wan deran de, di nav çerxên îşkencê de winda dibe. İsmet Sezgin jî mesul e***

Zafer Mutlu, tiraja Sabahê kiriye mêzîna rojnamevantiyê. Sabah, 60 hezarî û 600 hezarî jî bifroşe bê fonksiyon e. Tu fonksiyona rojnameyan îro li Tirkiye nema ye.

**HELEB-ZAXO ÊRÎWAN**

Welat, di demeke nêzîk de wê li Kurdistanê tev de belav bibe. Heleb-Zaxo û Êrîwan sê navnîşanên me yên nû ne. Xwendevanên me wê ji vir û pê de karibin Welat li van her sê bajaran bibînin. Di demeke nêzîk de emê bişînin Bêrûdê jî. Ji bo buroya Êrîwanê em haziriyê dikin. Di van rojên pêşîya me de wê vebe.

**XEBERÊN SORANİ**

Xwendevanên me yên li Kurdistana Başûr dixwazin em zêdetir cih bidine nivîsên soranî. Heta niha me nivîsarên soranî weşandin, lê hem gelekî kêm bûn, hem jî bi tenê li ser kulturê bûn. Em dixwazin bûyer û nûçeyan jî bi soranî biweşînin

Ji bo rojnameyeke xwerû bi kurdî û li her aliyê Kurdistanê belav dibe 16 rûpel hindik in. Gelek nivîsar, ji bo ku cih nîne em nikarin biweşînin. çend mehên din emê rûpelên Welat zêde bikin.

Bimînin di xweşiyê de...

## FERHENGOK

**Balkêş:** Eleqekêş, enteresan, (ilginç)
**Berçavk:** Çavik (gözlük)
**Bermayî:** Kalıntı
**Civak:** Civat (toplum)
**Civakî:** Sosyal (toplumsal)
**Dews:** Şop, rêç (iz)
**Dîmen:** menzere (görünüm)
**Girtîgeh:** Zîndan
**Giyan:** Ruh, can
**Hejar:** Feqîr, sefîl, reben.
**Kelem:** Astengî, (engel)
**Komar:** Cumhuriyet
**Nûjen:** Modern
**Nirxandin:** (değerlendirme)
**Parastin:** (korumak)
**Pest:** Baskı
**Pêşniyar:** Teklîf (öneri)
**Piştgirî:** Destek
**Rêz:** Giram (saygı)
**Rêzdar:** Birêz (saygın)
**Rêzdarî:** Girambarî (saygınlı)
**Rêwî:** Yolcu
**Sergotar:** Başyazı,
**Sitembarî:** Zordarî, zilm
**Şênî:** Gel, girse (halk, kitle)
**Tengizîn:** Hêrsbûn, acizbûn
**Têgihiştin:** Famkirin
**Tewanbar:** Xwedî sûc (suçlu)
**Wêran:** Xerab, xopan
**Xwendekar:** Telebe (öğrenci)
**Xwendevan:** (Okuyucu)

NAMEYÊN XWENDEVANAN NAMEYÊN XWENDEVANAN NAMEYÊN XWENDEVANAN

## Zimanê Welat giran e

Derketina Rojnameya hefteyî (Welat) em gelek şa kirin. Ez her hefte nebe jî, distînim, dixwînim û didime xwendin. Vê rojnameya me hindik be jî, valahiyek tijî kir. Lê gerek em nesekinin, bixebitin.

Gotineke min ji we re heye: Welat ji gelê me re giran tê. Daxwaza min ev e, ew rûpela ku we ji bo zarokan cuda kiriye hê hebekî sivik bikin. Bi helbestên sivik bixemilînin û gelek wênê tê de biweşînin.

Sebeba vê gotina min jî ev e. Xwendevanên li dibistanên bilind dixwînin û yên di nava doza Welat de pêşî cih girtine pirr-hindik, hinek tiştan dizanin. Lê gelê me yên din xwendina wan pirr-hindik hebe jî, ew zû bi zû nivîsa ji hev dernaxin. Ez vê babetê jî bibêjim, gelê me xerîbê alfabeya xwe ye. Di rûpela zarokan de wêneyan çêbikin û li hember navên heywanan yên fêkiyan û yên hwd. binivîsînin bila gelê me zimanê xwe di serî de hîn bibe. Hûn li jêra derencokê sekinîne piyên xwe davêjin jorê. Hûnê gavê me biqelêşin.

Ji we tevan re gelek silav

***Ciwan Rûbar***
***Gelyê Zîlan / Erdîş***

## Çend gotin ji rojnameya Welat re

Xwendevarên xweştivî!

Hevalno! Bi rastî karê herî girîng di rewşa îro da hezkirina çandê û bi taybetî xwendinê ye, ya ku mirov pê gelekî xwe pêş dixîne. Divê nifşa (cîla) nû xwe pê ve mijûl bike! Li gor têkiliyên min yên xurt di gel Kurdan li derveyî welêt, ez diêşêm bêjim ku Kurdên îro ji xwendina kurdî xwe dûr dixînin û cihê mixabinê ye ku ew xwe nêzîkî tiştên vala dikin...

Heger ew delîv (firset) li navbera 1900-1992 ji destên bav û bapîrên me çûn, bila ji destê me neçin. Divê em niha dest pê bikin. Bixwînin û ji zimanên din wergerînin. Divê em bav û bapîrên xwe ji bîr û nekin yên ku al û dirûşmên (siloxanên) serxwebûnê hilgirtibûn.

Erê! Em dikarin bi xwendinê, Kurdên mirî û nîvmirî hişyar bikin û bi wan welatê xwe yê wêrankirî ava bikin...

Bi rastî belavkirina çapemenî û bandên kurdî yên folklorî bi xwe barê her mirovekî welat û gelparêz e. Divê em bi şoreşeke çandî, hendesî (mîmarî), felsefî û werzişî (sporî) rabin û nexweşiya nezanîne hilweşînin û wêran bikin. Bi kurtî, mirovê hişyar û zana bi xwe rêzdar (muhterem) e û nimûneyekî hêja ye li nik her gelekî li vê cîhanê... Hezkirina xwendinê bi xwe kilîla (kilîta) mana gelê me yê bindest e. Wisa divê em gelek bi çavekî bilind li şehîdên xwe binêrin. Ji ber ku ew ji bo azadiya gelî û serxwebûna welêt xebitîn...

Li dûmahiyê, rojnameya welat bixwînin û belav bikin! Di gel vê jî pêşbixînin!.. Û pêşxistina wê divê em çîrok û stiranên Botan, Hekarî, Badînan, Soran û Mûkiryan bi kar bînin. Wisa rêzimanê Botanî, Hekarî û Behdînanî. Ji ber ku ev sê zarava paqij, tekûz (temam) û rast in...

Di xweşiyê de bimînin!

***Beşîr Botanî***

## Rojên îmzeyê

Şaîrê Kurd JAN DOST rojên 14 û 15'ê Tîrmehê (Temmuz) di navbera saet 12-17 an de, li MKM'ê pirtûka xwe ya helbestan "KELA DÎMDÎMÊ" wê ji bo xwendevanan îmze bike.

**Navnîşan: Mezopotamya Kültür Merkezi**
**Tarlabaşı Cad. No:128 Beyoğlu / İstanbul**

## Hizb-î Barbar

Li vê rojhilata navîn
Sê dijmin hene wek kore
mar
Bo wan mertal e ol û dîn
Axa Kurda kirine par

Ez çi dikim qîr û hawar?
Şiyar nabe gelê xewar

Vaye Ereb çend dewlet in
Tirk û Faris bi rûmet in
Bo me Îslam yek umet in
Mafên me nas nakin tu car

Maf nadin me ew gurên har
Bistînin bi kotek û dar

Dijminî, nîjadperestî
Bo wan bûye rê û rastî
Dev kirine goşt û hestî
Vedikin birînên xedar

Êdî bes e bibin şiyar
Ta kengî bimînin hejar?

Hinek kirine cerdevan
Hin kirrîne bi diravan
Hinek bûn kewên ber davan
Ew bûne noker û neyar

Berxwedanê bikine kar
Da birevin pîs û gemar

Dîsa tu çare nekirin
Zor û reda me nebirin
Bi navê oldara mirin
Li gelê Kurd kirine bar

Ew dibêjin em in oldar
Ez dibêjim Hizb-î barbar

Lew hûn hizba zordestan e
Hûn li dijî bindestan e
Ey xwînrêj ev Kurdistan e
Tu car ji we re nabe yar

Hûn pêşmal in ji bo xwînxwar
Li dijî gelên birîndar

Jîr Dilovan im dil fireh
Bo we nabêjim Hizbullah
Ewê bo min bibe guneh
Oldar tu car nabin bê ar

Kurdistan bo we nabe war
Vê zanibin Hizb-î barbar

***Jîr Dilovan***

## Ma biratî wisa ye!

Ez vî nameyî ji te re dişînim. Tu jî, wî li hember Komara Tirk, di rûpelên xwe de biweşîne.

Ez û hevalekî xwe em çûn Bursa'yê ji bo em di karistanekê de bixebitin. Midûr gazî me kir go: "Hûn xelkê kurê ne?" Me got: "Em xelkê Agirî ne" Ji me pirsî: "Qey hûn Kurd in?" Me got: "Erê!" Wî jî got: "Herin! Çavê min bi we nekeve. Kurd ne miletê me ne!"

Lê hûn Tirk dibêjin em birayên hev in. Ma biratî wisa ye? Ji vê û pê de emê zincîrên koletiyê ji stûyên xwe derxin. Koletiya TC ê bes e.

Ey gelê Kurd! De rabin destê xwe bidin hev û çavên xwe vekin.

***Mahkum Karataş***
***Patnos / Agirî***

## KARTA ABONETİYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ... pê ve min bikin aboneyê Rojnameya **WELAT**

Nav :
Paşnav :
Navnîşan :

**Bedelê abonetiyê razînin:**
**Li Tirkiyê** : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu Şub. Hesap No: 379809
**Li Derve** : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu Şub. Döviz tevdiat hesap No: 3113617

**Aboneyên hêja,**
Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin. Navnîşana WELAT Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D.4 Cağaloğlu / İSTANBUL
**Tel:** 511 57 60-511 66 02 **Fax:** 511 51 57

**Mercên abonetiyê:**

| | Li hundir | Li derve |
|---|---|---|
| 6 meh | 60.000 | 30 DM |
| 12 meh | 120.000 | 60 DM |

# 'Kelemê çavê dijmin'

Wedat Aydin şoreşgerekî Kurd bû. Wî bîr û bawerî bi têkoşîna neteweyî ya gelê Kurd anî bû. Vê bîr û baweriyê heya dawiya jiyana wî domand. Têkoşîna wî ya bi biryar tirsê xistibû dilê dijmin; lewma hêzên xwînxwar û neyarên gelê Kurd kuştina wî pêwist dîtin.

Yên wekî Wedat bi girtîgehan, bi zîndanan û bi îşkenceyan serî natewînin li ber dijmin. Dîroka têkoşînê ya gelê Kurd ji mêrxasên wekî **Kemal Fewzî, Bavê Tûjo, Bijîşk Fûad, Şêx Seîdê Kal, Xalit Begê Cibirî, Usif Ziya, General Ihsan Nûrî, Elîşêr, Zerîfe, Seyid Riza, Nûrî Dêrsimî, Neco, Egît, Wedat...** û gelek qehremanên bênav û deng re şahid e. Dîroka me û çiyayên Kurdistanê mêrxasiyê bi çavên xwe dîtin. Şerê me yê ji bo azadî û serxwebûnê, ji bo jiyanek nû û bi rûmet, bi beşdarî û bi pêşengiya xortên Kurd herdem geş û xweş bû. Agirê azadiyê netefiya û şewqa xwe da tevê Kurdistanê. Kurdistan roj bi roj ber bi azadî û ber bi ronahiyê diçe. Di vî şerî de civaka Kurd endamên xwe yên herî hêja û bikêr winda kirin û winda dikin. Bêguman windakirina Wedatan ne hêsan e; lê ku Wedat xwe feda nekin, ku **Necmedîn Buyukkaya** xwe Feda nekin û ku **Egît** dest navêjin qevda tivingê, dê çawa ev tarîstan û ewrê ku bi ser welatê me de girtine rabin. Dê çawa civata Kurd ji tarî û tarîstanan rizgar bibe û ber bi ronahiyan ve here.


Jiyana Wedat kin, lê serbilind bû. Evîna azadiyê ketibû dilê wî û tu hêzekî nikaribû vê evînê ji dilê wî derxe. Evîna azadiyê, dil li Wedat kiribû pola. Ev dilê ji pola bûbû tirsa dijmin û xewa dijmin direvand. Lewra dijminên gelê Kurd baş dizanibûn ku Wedatên Kurdistanê welatê xwe ji xwînmijan re nakin yar. Ew bi hebûna xwe, bi zanîna xwe, bi giyana (ruh) xwe, bi xwîna xwe û bi mêrxasiya xwe welatê xwe diparêzin. Dilê wan ê ji pola ji bo welatekî serbixwe û azad lêdixe. Ew hêza xwe ji gelê xwe distînin. Lê dijmin? Dijmin û nokerên (xulam) xwe hê ji serî de têkçûnê pejirandine û ew di ber Wedatan nadin. Wedat hêza xwe ji gel û ronahiyê, dijmin hêza xwe ji tarîstan û kedxwariyê distîne. Lê em baş dizanin ku tarî di ber ronahiyê nadin.

Wedat, bi nasnama xwe, bi jiyana xwe, bi kirinên xwe û bi têkoşîna xwe şoreşgerekî Kurd bû. Ew bi kurdî dijiya û wî bi kurdî bersiva xwe dida. Wedat bi mirinê re jî bi kurdî axivî û wî di goristanê de jî, bersiva xwe bi kurdî da. Wekî ku helbestvanekî Kurd dibêje ew:

"Kelemê nav çavên dijmin
Dostê dostan" bû. Mirov dibêje qey **Seydayê Cizîrî** vê helbesta xwe ji bo mêrxasên mîna Wedat gotiye:

**"Gula baxê îremê Botan im**
**Şevçiraxa şevên Kurdistan im."**

Bi rastî jî, ew gula baxê îremê Botan û ronahiyek ji ronahiyên Kurdistanê bû. Kurdistan bi yên wekî wî xweş, geş û serfiraz e.



*Jiyana Wedat kurt, lê serbilind bû. Evîna azadiyê ketibû dilê wî û tu hêzê nikaribû vê evînê ji dilê wî derxe. Evîna azadiyê, dil li Wedat kiribû pola.*

## WEDAT AYDİN Û ZİMANÊ KURDÎ

Dijminên gelê Kurd ji bo ku navê Kurd û Kurdistanê ji holê rakin û gelê Kurd di nav tarîstanan de bifetisînin êrîşî zimanê kurdî kirin. Ji ber vê yekê bi hovîtiyekî nedîtî dest bi qirkirina zimanê kurdî kirin. Qirkirina ziman ji qirkirina gel hovtir e. Di qirkirina gelekî de tunekirinekî fîzîkî heye; lê di qirkirina zimanê gel de jiyanekî kuştî heye. Ew mirovên ku zimanê wan ê zikmakî ji wan tê standin tu mane û rûmetekî jiyanê li ba wan namîne. Ev ji bo gelan jî wisa ye. Wekî ku nivîskarê Macarî **Andres Suto** dibêje: "Gelekî xwedî giyanekî genetîk e û ev giyan bi wasita zimanê zikmakî tê domandin û dijî." Gelê Kurd hovîtiyek wilo dîtiye ku ev rûreşiyekî mirovatiyê ye. Gelê Kurd qirkirin, birçîbûn, hêsîrî, bindestî û koletiyê dîtiye; lê tu tiştekî bi qasî qirkirina zimanê kurdî ew neêşandiye û birînên xedar di laşê wî de çênekiriye.

Şoreşgerê Kurd Wedat yek ji wan mirovan bû ku baş bi têgiha bêbextiya qirkirina zimanê kurdî dizanibû. Ew bi vî tawrê xwe şagirtekî **E. Xanî, Xelîl Xeyalî, Celadet Bedirxan û Doktor Şivan** bû. Li ba dilê wî ziman xîret û xîret jî welat bû. Wedat yek ji wan ronakbîrên Kurd bû ku bi hesta neteweyî li zimanê kurdî xwedî derket. Wî baş dizanibû ku parastina zimanê kurdî, di xwendin, nivîsîn û axaftina kurdî de derbas dibe. Lewma ew di jiyana xwe ya rojane de bi kurdî dipeyivî.

Gava ku Wedat di Qongra Komela Mafên Mirovan de bi kurdî peyivî, gelek nîjadperestên Tirk ên ku xwedênegiravî mafên mirovan diparastin ji salona qongreyê derketin derve û ev tawrê wî protesto kirin. Vê bûyerê bi eşkereyî ev xêliya ser çavê nîjadperestan rakir. Wedat hat girtin lê di dadgehê de jî bi kurdî peyivî; lewra wî dizanibû, yê ku di dadgehê de ji alî kedxwar û nîjadperestan de tê darzandin (mehkemekirin) zimanê kurdî ye.

Yên ku neyartiya zimanê kurdî dikin ew nabin dost û birayê gelê Kurd. Wedat ev didît û di vê baweriyê de bû.

Neyarên gelê Kurd di pêncê Tîrmehê de Wedat ji mala wî hilanîn û ew bi hovîtî kuştin. Gelê Kurd di dîlana cenazê wî de amade bû. Wê rojê Kurdistan rabû ser piyan û qîrîna gelê Kurd a ji bo serxwebûn û azadiyê asîman qelaşt. Di wê rojê de dîsa xwîna gelê Kurd rijiya. Lê gelê Kurd ew sozê ku dabû lawê xwe bi cih anî.

Stêrkek xuricî ji esmanên Kurdistanê, lê bi hezaran stêrk ketin şûna wê; esmanên Kurdistanê bêtir sayî û ronî bûn.

Gelê Kurd Wedat di dilê xwe de veşart.

Gelê Kurd ji **Diyarbekira şewitî** re, ji **Dêrsima Wêran** re, ji **Geliyê Zîlan,** ji **Meydana Çarçira** re û ji **Helebça Jarkirî** re soz da ku wê tola Kurd û Kurdistan, xwîna şehîdan li erdê nemîne.

***Felat Dilgeş***

# KONEVANİYA NÛ

**R. Cizre**

## Riya şerê psîkolojîk girtî ye

Piştî sala 1947 an Tirkiye bi temamî bûye perçeyek ji sîstema dagîrkeriya nû. Li gora berjewendiyên emperyalîzmê jî çînên serdest yên Tirk tim û tim rola xwe leyistine. Hovîtî û barbariya wan dersên mezin dane hemû faşîstên cîhanê. Lewre mirovekî weke **Hîtler** dibêje: Mamosteyê min **Kemal Paşa** ye.

Ev rastiyeke ji devê Hîtler derketiye.

Dewlet, dewleta "Mamosteyê Hîtler" vê rojê li kêleka bi kar anîna zora reş û kor hemû metodên şer yên ekonomîk, siyasî û psîkolojîk jî dixe xebatê.

Navê şerê ku bi van metodan tevan tê kirin, şerê taybetî ye. Şerê psîkolojîk jî perçeyekî vî şerî yê herî bê exlaq û bê qanûn e û qet prensîbên mirovahiyê nas nake.

Şerê psîkolojîk bi armanca ji hevxistin û perçekirina gel tê dayîn. Lewma pişta xwe dide bi kar anîna kêmanî û nexweşiyên ku di nava gel de peyda dibin. Her wiha hewl dide ku nexweşî û nakokiyên bê bingeh (suni) werin derxistin. Valebûn û dijatiyeke mezin dixe nava cudahiyên dînî, kulturî, zimanî û neteweyî û bi van pirsan dixwaze civakê li gora xwe bitewîne û ji bo hatina xwe eyar bike. Çi dema rejîm bikeve tengasiyê jî, hewara xwe digihîne xurtkirina şovenîzmê.

Çek û navgînên (aletên) şerê psîkolojîk yên bingehîn rojname, kovar, radyo, TV, sînema, muzîk û hwd. in. Bi van çekan jî her cure virrên bê hesab, demagojî, komplo û senaryoyên sexte têne amadekirin û bi van tiştan dixwazin berê enteresa gel bidin tiştên pûç û vala.

Erê, dewleta Tirkiyê di kuştina gelan de xwediyê serpêhatiyên mezin e. Niha jî ji Kurdan re dibêjin "Hûn me nas nakin, pirsa me ji Ermenî û Roman bikin." Şovenîzma Tirkiyê vê rojê hemû saziyên dewletê û artêşa xwe ya faşîst weke nirxên herî pîroz diyar dike. Dewlet, artêşa xwe weke efsaneyekê nîşan dide ku ne mumkun e bişkê. Lê hema em qurbana **ARGK** bin çawa ew rezîl û riswa kirin.

Vê rojê şerê psîkolojkî yê dewletê du aliyan dide ber xwe ew jî ev in:

-Dixwaze baweriya gel bi Serokatiyê (PKK) bişkîne û hêza gel weke komeka terorîstan nîşan bide. Ji bo vê pirsê jî, dixwaze komplo û provakasyonan peyda bike. Ji bo girêdana bi Serokatiya Partiyê ve qels bikin rojê hezar derewan bi devê provakator îxanetperestan dike. Vê yekê ne tenê bi kovar û rojnameyên xwe dike, lê hemû rojname û kovarên kontra jî dixe dewrê, her çiqasî ku hinek rojname û kovar li qutubê bakur jî derdikevin û tîraja wan 100-200 heb jî bin, dîsa di nava planên wezareta derve ya Tirkiyê de cihên xwe digrin û çarçova wan ji hêla pisporên **MGK** ve tê danîn.

-Dixwaze gel têxe nava heyecanê, tirsê û panîkê peyda bike. Ji bo vê jî, livbaziyên kontra derdixe, jin û zarokan dikuje, êrîşê ser tirênên rêwiyan dike, gel birçî dihêle û dawî sefseta xwe tekrar dike: "Derfet nîne dewlet bişkê, dewlet mezin e, xelasî tenê bi dewletê dibe." Hêviya dewletê ji vê yekê, şikandina moralê gel û îzolekirina Partiyê ye.

Rojnamegeriya "babialî" di serî de bi xurtî karê xwe dike. Gelo li gora Hürriyetê çend caran PKK "paramparça" bûye? Li gora Milliyet, Günaydin û Tercümanê çend caran PKK perçe bûye û çend caran Serok hatiye kuştin. Li gora Sabah û K.Pressa MGK çiqas ton heroyîn di Akademiya Mahsum Korkmaz (cihê mirovahiya herî pîroz) de hatine çêkirin.

Helbet,, posîdeya (etkiya) şerê psîkolojî gelek e. Belê di civateke xwedî serokatiyeke gelêrî ya rast de, civateke ku gundî û karkerên wê bi metodên herî demokrat, pirsên şoreşê biaxivin wê çaxê şerê psîkolojîk dibe balonek vala û diteqe.

Şerê psîkolojîk êdî tiştekî nikare bike. Dewlet û peyayên xwe, yên hundir û derve jî, wê biteqin.

Gelê Tirk nabe dijminê gelê Kurd. Armanceke Kurdan li dijî gelê Tirk nîne. Em cîran in û dikarin cîranên hev yên gelekî baş bin jî. Çi sexte- nivîskarên simbêlên xwe bêhin dikin û mîna keran dizirrin, biratî û cîrantiya gelan qebûl nakin, tiştekî wan bi Kurdan ve girê bide nîne, bila aqilê xwe bînin serê xwe û hiş bin.

# Romanya: Welatekî bê xwedî

**● Ji ber gelek sebeban ku ne pêdivî ye em wan şîrovekin, vê dawiyê bi serdanekê em çûne welatê kiştûkalê, welatê kongre û konferansên aştiyê, em çûne Romanya. Ji bo ku em her dem hîn bûne "du (2) çûçikan bi kevirekî bikujin", me xwest em li gel çûna xwe "Sosyalîzma" li wir jî binirxînin. Da ku em sosyalîzm û welatê "sosyalîst" nas bikin, girîng e em vê pirsê bidin ber çavên xwe.**

**Dilbixwîn**

(1)

Piştî hilweşandina **Yekîtiya Sovyetê** û têkçûna Sosyalîzma Reel, ku gelek ziyan û zirarên mezin gihandin xwe û neteweyên li dora xwe, hevbenda **Warso** û **Yekîtiya Ewrûpaya Rojhilat** ku li ser hêza Sovyetê hatibû çêkirin, ji hev ketin. Em di vê barê de dirêj nekin ji ber ku hemû kes senaryoyê dizane û dikare bike romaneke ji sedan rûpelan. Ji lewre em tenê dikarin pirsekê bikin, gelo sedem çi bû ku bi hilweşandina Sovyetê re Ewrûpaya Rojhilat û Partiyên Komunîst hebûna xwe fesix kirin û dikin jî, hûn dizanin gelek Partiyên ku berê Komunîst bûn, niha navê xwe diguhêrin û dibin Partiyên Demokrat..?

Em tenê dikarin bi vî awayî bersivê bidin. Ew dewlet û Partî serbixwe nehatibûn damezirandin, bi destê Sovyetê hatibûne çêkirin. Weke tê zanîn dema ku aborî (ekonom) ne serbixwe be, siyaset jî hingê ne serbixwe ye. Rewşa ku dewletên nav li xwe kiribûn "Sosyalîst" ev bû. Mîna "Ajanan" ji Sovyetê re dixebitîn. Têye bîra min carekê serokê Partiya Komunîst a Sûriyê **Xalid Begdaş** di civînekê de gotibû: "Eger baran li Moskoyê bibare, ez li vir sîwanê vedigirim." Hemû bûbûn peyayên Moskovayê, weke ku niha maşella "Serokên" Başûrê Kurdistanê bûne peyayên Enqereyê, hebûna xwe bi paytexta Tirkiyê ve girêdane, wê encam çi be!

Van pêşveçûnên siyasî yên vê dawiyê îspat kirin ku, bi rastî "Tiştek ji serxwebûn û azadiyê bi rûmettir nîne!" Eger ne serbixweyî be, tu hêz, tevger an jî kes nikarin bi xwe biryaran bistînin û bi xwe jî, di karvaniyê de pêkbînin, nimûne; Sovyet, dewletên "Sosyalîst" û Partiyên "Komunîst". Ne tenê ev, KGB (Îstîxbaratan Sovyetê) tiliya wê di avakirina wan partî û dewletan de, berî her kesî hebû, vê yekê jî, serokên KGB pişt hilweşandina Sovyetê itîraf dikin.

Ji ber gelek sebeban ku ne pêdivî ye em wan şîrovekin, vê dawiyê bi serdanekê em çûne welatê kiştûkalê, welatê kongre û konferansên aştiyê, em çûne Romanya. Ji bo ku em her dem hîn bûne "du (2) çûçikan bi kevirekî bikujin", me xwest em li gel çûna xwe "Sosyalîzma" li wir jî binirxînin. Da ku em sosyalîzm û welatê "sosyalîst" nas bikin, girîng e em vê pirsê bidin ber çavên xwe.

Lê berî ku em derbasî nava Romanya û rewşa wê ya siyasî, civakî û aborî bibin, ez dixwazim ji we re çend dîmenên komedîkî, ku ji wan dîmenan (menzer) ve "sosyalîzma" Romanya tê naskirin, bînim ziman.

Ez û hevalekî ji rojava em bi rê ketin. Lê berî ku em li trênê siwar bin, hevalekî ku heya stasyonê alîkariya me kir got:

-Bila di trênê de haya we ji we hebe. Di trênê de diz gelek in.

Gotina hevalê me bala me kişande ser xwe, ji lewre heya ku em gihîştin stasyona Bukureştê xew hate ser çavên miriyan û nehate ser çavên me, em heya wê derê hişyar û çav vekirî man. Bextê me ye, ji her derê bêtir li welatên berê "sosyalîst" pirr in.

Trêna me bi rê ket, lê çi rêketin bû! Mîna nexweşekî serxweş tol bû. Te digot qey ji çerxa navîn anîne der. Trêneke zengarî, kursiyên wê bostek toz û gemar li ser rabûye dema ku mirov derbasî fargonên wê dibe, tu dibêjî nexweşxaneyeke û bi dehan nexweşên birîndar tê de hene, ji bêhna gemarî poz û bêvila mirov diteqe. Em li ser fargonan geriyan ji bo ku cihekî rûniştinê bibînin, hemû fargon vala bûn, lê mixabin cihê danıştinê tune bû. Min ji hevalê xwe pirsî:

-Gelo, ev trêna kîjan dewletê ye?

Hevalê min hinekî keniya û got:

-Bawer bike ez nizanim, were em bixwînin.

Em bi hev re ji hundirê fargonê derketin (em çenteyên xwe ji tirsa dizan re ji destê xwe danaynin), me li koşeyekî fargonekê dît bi îngîlîzî nivîsandine: Made in Romanya. Me hingê dizanî ku trên a Romanya ye.

Dengê şînge-şînga fargonan mîna cazan di bin guhên me de lêdiketin, tu nema bû ku perdeyên guhên me biqetînin. Bi rastî me ji trênê ve dizanîbû ku hundirê Romanya bi çi awayî ye. Bi rewşeke xirab trêna me ya nexweş xwe gihande Budapêştê. Eger ew stasyon tuneba, bê guman trêna me li nîvê rê disekinî, tenê tiştê ji dest me bihata kolandina gorekê bû.

Saet bûbû 3'ê şevê. Em li stasyona Budapêştê ne.

Me hew dît ku 11 kesên çavsor, her yekî çakûçekî ser mezin di destê wî de ye, ji ser kursiyên ku li stasyonê bûn, rabûn û ber bi trênê ve hatin. Gelekî bi hêrs bûn, te digot qey trênê bavê wan di bin xwe de perçiqandi ye. Bi rastî wê şevê şêniyê Budapêştê tev bi xwe hesandin. Trêna bextereş wê şevê dane ber devê çakûçan. Sekinandina me saetekê domand, di wê saetê de dengê çakûçan em gêj kirin. Mîna ku di dora laşekî mirî re bigerin, wiha çakûç kiribûn destê xwe û trêna me çember kiribûn. Me ji yekî pirsî:

-Ev çi dikin?

Li me meyizand û bi zimanekî tûj gote me:

-Kontrol!

Hevalê min pirsî:

-Çi kontrol dikin?

Dîsa xwe dîk kir û got:

-Burxuyan dişidînin.

Min di ber xwe de got: Wey histûyê we li hev bişide, piştî ewqas pêşveçûnên teknolojîk hûn burxuyan bi vî awayî dişidînin...

Û... li dawiyê trêna ku erbaneya Xalê Cimo ya ku hespeke zebûn û çav beloq dikişand jê xurttir dimeşiya, bi rê ket. Piştî teqûteq û serêşandineke bi çend serxweşan re, ku dixwestin bizanibin çi di berîkên me de hene, em gihîştin sînorên Romanya.

Me gelekî dibihîst ku li welatên "sosyalîst" bêroqratîzmeke bê sînor heye, lê bi rastî me texmîn nedikir ku bi vî awayî be. Ez nimûneyekê bidim, hûn jî ji xwe re binirxînin. Ji bo kontrolkirina pasportan 5 polîsên sînoran hene, gelo wezîfeya wan çi ye? Yê yekê derbasî hundir fargonê dibe û dipirse: Pasport!.. Em pasport derdixin, ji dûr ve lê dinêre û derbas dibe. Yê dudiyan: Pasport! Em pasportan derdixin. Ji destê me digire, dirûpelîne, dîsa dide destê me û diçe. Yê sisiyan: Pasport! Ew jî navê me dipirse, li wêneyê dinêre, li me dinêre û ji me dipirse: Hûn ji bo çi diçin Romanya? Dolar bi we re hene? Hûnê çend rojan bimînin? Em bersivê didin. Bersivên me li ser pelekê dinivîse, pasportan dide destê me û diçe. Yê çaran- diyar e ku bi zorê ji xew rakirine- : Pasport! (bi xeyd). Pirr li pasportê nanêre, çavên wî li çenteyan in. Pasportan davêje ser me û bi hêrs dibêje: Çi di çenteyên we de hene? Em bi Romanî nizanin, lê ji çav û destên wî de em têdigihîştin, ew çi ji me dixwazin. Me bi zimanekî xweş got: Book (pirtûk). Fêm nekir, li rex me rûnişt û çente bi destê xwe ve anîn, vekirin. Berî ku çenteyan veke, gote me: Şîşe... şîşe! Em tênegihîştin me got: Çi şîşe? Dîsa got: Şîşe... Me bi nezanî seriyê xwe hejand. Dema ku dît em seriyê xwe dihejînin, çav di kortikan de sekinîn. Hema çente vekirin. Ji nişke ve hêrs bû, ji ber ku tiştê lê digeriya di çenteyan de tune bû, ji bilî pirtûk û hinde tiştên din tiştek têde tune bûn. Bi hêrs çente di erdê de lêxist û got: No... no, Wîsky! Me hingê dizanî ku mîna Şivanê Gulistanê li Wîsky digere. Li çavên me nihêrî, weke ku bibêje: "Ne hûn bin û ne jî mêvandariya we be" ... Belê, bi vî awahî serleşkerê sê stêrk li ser milê wî bûn- diçe. Yê pêncan derbasî hundir dibe. Sandixeke mîna ew kesên ku li kolanên Kobaniyê rûniştine û solan boyax dikin, bi sînga wî ve daleqandiye: Pasport! Em pasportê didin wî jî. Ew jî mîna her çarên berê pasportê dirûpelîne. Sandiqa xwe vedike, moreke giroverî derdixe û li ser Vîzaya Romanî dixe.

Berî ku pasportê bide destê me, dipirse: Wîsky! (Ango Wîsky heye). Me serê xwe hejand û got: No! Dîsa pirsî: Marlboro (Li cigareya Marlboro dipirsî). Hevalê min paketek derxist û da dest. Wekî ku me bavê wî ji gorê derxistibe, hezar carî ji me re got "spas". Bê guman me dizanî spasî ne ji bo me bû, ji bo cigareyê bû.

Bi vî awayî em gihîştin Romanya. Mebesta min ji van dîmenan ew e ku em bizanibin, ji bo çi şêniyê welatên "sosyalîst" dibin evîndarê Ewrûpaya Rojava. Sedem eşkere ye, ev tiştên li wan deran dibin li Rojavayê Ewrûpayê tune ne, ji ber vê yekê li pêşiya daîreyên penaberan bi sedan kes hene dixwazin bibin penaber.

## GOTÎN

**Yaşar Kaya**



# Gazin

Tu heqê me Kurdan nîne em gazin bikin. Lê belê, em dîwarê kela Pollesore jî nînin. Mirin heq e, xwedê me di kalîtî û pîrîtiyê de şaş neke.

Ez dîna xwe didimê, gelek hevalên ciwan hene ku qet bi qedr û qîmet nizanin. Gelek feqî û melayên me hene ku ji medreseyên Kurdistanê derketine. Ew edebiyata kurdî yê klasîk gelek baş dizanin. Bi tîpên erebî çiqas pirtûkên bi kurdî, erebî û farisî hebin dixwînin û ji wan pirtûkan hînê zanyariyê dibin. Ev mela û feqiyên Kurd ji bo edebiyat û çanda kurdî gelek xizmetên bi rûmet kirine û gelek berhemên giranbuha kirine malê çanda Kurd. Îro ji van mirovan gelek jê kal û pîr bûne, mixabin kesê ku cihê wan tijî bike li dû wan nîne, lewra, êdî ji medreseyên Kurdistanê zana û nivîskar dernakevin, mela û feqiyên ciwan guh nadine vî karê bi rûmet. Berê di Kurdistanê de, malbatên dewlemend, di meha Remezanê de gazî feqî û melan dikirin, ew dihanîn malên xwe. Mela û feqî, dersên dîn û dînayetê didan, lê belê, bi pirrayî di civatan de behsa kitêbên **Ehmedê Xanî** (Mêm û Zîn. Nûbar, Eqîda Îmanê) û berhemên nivîskar û zanayên Kurd yên din dikirin. Mixabin, di van salên dawî de civatên wiha nemane.

Di van 30 salên dawî de, min bi gelek feqî û melayan re hevaltî kiriye, ez ji wan hînî gelek tiştan bûme. Îro jî, em li benda van feqî û melayên dilsoz û zana ne, ku tevlî xebatên karê Enstîtuya Kurdî bibin. Li Enstîtuyê, ji bo wan gelek xebat û kar heye, ew dikarin edebiyata kurdî ya klasîk, ji tîpên erebî wergerînin latînî û bikin kitêb, ji erebî û farisî jî kitêban wergerînin kurdî û çap bikin.

Eger civakzan (sosyolog)ên Kurd, rojekî li ser çîn (sinif)a ruhban (dînî) ên Kurd lêkolîn bikin, wê bibînin ku di nav wan û ruhbanên cîhanê de gelek cudahî hene. Li Ewrûpa çîna dînî, xwedî mal û milk'e, kilîse dewlemend e û tim şirîkê dewletê ye. Li Îranê jî wisa ye. Mollegiş xwedî erd in, mal û milkên wan gelek in, heta şah jî nikaribû mal û milkên wan, ji wan bistîne, ku dawî bi saya vê dewlemendiya xwe berî şah dan û ew ji Îranê derxistin. Lê belê, li Kurdistanê ne wisa ye. Dîndarên Kurdistanê, ne mîna kilîseyên Ewrûpa şirîkên dewletê ne, ne jî mîna yên Îranê xwedî erd û milk in. Giş di medreseyan de dijîn û xelk wan xwedî dike, mele û feqî bi hev re, mal bi mal xwarin berhev dikin û tev bi hev re dixwin. Yanî çîna ruhbanên Kurd proleter e, feqîr e, ji ber vê jî şoreşger e, welatparêz e û tim li cem gelê xwe ye.

Biyaniyên talanker, destnivîsarên Kurd yên di destê gelde, yan dizîn, yan jî veşartin. Ev destnivîsar xezîneyên çanda me ne, divê em wan berhev bikin û di bin siya Enstîtuya Kurdî de bikin pirtûk, ku ew jî, bibin perçeyek ji dewlemendiya çanda me.

Edebiyata me, çanda me, zimanê me sebebê li ser pê mayîna me ne. Dewletên kedxwar heta niha nikaribûne van tiştên me winda bikin. Me bi saya van gencîneyên xwe heta niha xwe parastiye û me rêça xwe di tariyê de jî ajotiye, ew mifteyên gelek deriya ne, wê hêj gelek derî li me vekin.

# Alınak gazî mebûsên Kurd dike

***Kekê Mahmut berya ku em pirsa avakirina Partiya nû bikin, bi kurtî sedemê veqetandina xwe hûn karin bînin ziman?***

-Ez çiqasî ji te re bibêjim di derheqê kêmasî û rexnan de hindik e, lewra gelê Kurd ne ji bo ku em lingan li meclîsê bavêjin ser hev, gelê me ji bo ku em karwaniyek (pratîkek) rind bidin, şandin. Li kul û birînên wan bibine xwedî, pirsgirêkên wan hal bikin, em bûne namzet ji bo gelê Kurd, lewra ji bo namzetiyê gelê Kurd, em neqandin û dane hilbijartinê, ji xwe me hê tiştek nekiriye û em çiqasî jî bikin, ji bo gelê Kurd hindik e, lewra pê bi pê em li ser xwîna gelê Kurd hatine meclîsê, girîng e ku em qîmet û rûmeta vê xwînê zanibin, her gav û kêlî di dilê xwe de bigrin û hilgirin, em zarwê gelê Kurd in, ev gel xwedî bawer û bi rûmet e, em jî, girîng e ku bibin layiqê vî gelî.

Di destpêka avakirina hikûmeta koalîsyonê de tesîra MGK li ser afirî, hikûmeta koalîsyonê bi destûr û emrê MGK gav avêt, hikûmeta ku li gora MGK bimeşe tê çi hêviyê jê bikî, hikûmeta koalîsyonê îtîfaqeke sê alî ye, ev jî SHP-DYP û MGK ne.

Ji bo veqetandinê bi rastî em gelekî dereng man, pêwist bû ku em ji serê ewil de veqetiyana. Lewra SHP, DYP û MGK îtîfaqa mîlîtarîzmê ne.

***Di destpêka Newrozê de dewleta Tirk qirkirinek bi barbarî li Kurdistanê kir, pey de bi çend rojan, 14 mebûsên Kurd ji SHP veqetiyan û nebûn hevparê rijandina xwîna gelê Kurd, bi van mebûsan re, ji bo çi hûn jî veneqetiyan?***

-Di pey qetlîama Newrozê de ez, **Selim Sadak**, **Orhan Doğan**, **Ercan Karakaş**, **Ziya Halis** û **Mustafa Yılmaz** em çûne **Botanê**. Me li kul û derdê gel guhdarî kir. Dû re em vegeriyan Enqerê, em heval tev civiyan, me bernamek amade kir. Me ji hevalan re got, emê derheqê vê qetlîama dewletê de, lêkolînên xwe yên Botanê bidine meclîsê, piştre em karin veqetin, ku em niha veqetin, wê çavê dinê û gel were ser veqetandina me, ev qetlîama ku dewletê kiriye ewê were windakirin, bi hevalan re li ser vê yekê tifaqa me nebû yek û hevalê me veqetiyan. Bi rastî jî bi veqetandina hevalên me, çavê dinê ji ser qetlîamê hate ser veqetandina mebûsan û qetlîam hate ji bîrkirin.

***Ew mebûsên ku ji Kurdistanê hatine hilbijartin, yên ku hê jî di hikûmeta koalîsyonê de cih distînin, ji bo wan hûn nabên çi, çi gotinên we ji wan re hene, an jî, ji gelê Kurd re? Lewra gelê Kurd hêviyek giran ji wan dikir, li ser qirkirina gelê Kurd bê deng û bê his mane.***

-Êdî ji vir pê ve, kes nema kare li ser xwîna gelê Kurd xwe bi qapan bike û di kursiyê de bizivirîne. Ger ku evîndariya wan li ser gelê Kurd hebe ewê ji SHP veqetin. Îro SHP destê xwe di xwîna gelê Kurd daye. Hêviya min ev e ku mebûsên Kurd û Tirk yên bi rûmet ji hikûmeta koalîsyonê veqetin.

***Armanca Partiya Azad û Wekhevî bi kurtasî hûn dikarin bînin ziman?***

-Vêga li Kurdistanê zilm heye, qetlîam heye, cerdevaniya gundan heye, tîmên taybetî hene, karistanên îşkencê ava kirine, qanûna terorê heye qanûna çiyê (dağ kanunu) heye, dewlet bi vî awayî li Kurdistanê siyaseteke li dijî mirovahiyê dimeşîne, ev talan e, ev qirkirin û windakirina gelekî ye.

Partiya me wê kelemek be li riya vê siyasetê û qanûnên dewletê, partiya me neyarê mêtinger û mijokdaran e, partiya me rastî û ronahî ye, yekîtiya gelê Tirk û Kurd e, tifaqî û yekîtî ye, wê bibe azadî û serfiraziya gelan. Ji bo aştî, biratî, tifaqî û mafên mirovan, em gazî hemû mirovên bi rûmet û demokrat dikin, partiya me partiya gel e. Ji bo vê yekê em dibêjin cihê her mirovê durust, dilxwaz, welatparêz û xwedî bawer di nava me de heye. Yek jî armanca me ku em vê nîjadperestiyê ji holê rakin û em bibin pir (köprü) di navbera gelê Kurd û Tirk de.



*Mahmut Alınak: "Ez cardin gazî mebûsên Kurd û mebûsên demokrat yê Tirk dikim û em li hêviya wan in.*

Girîng e ku em gelê xwe zana û serwext bikin, vê sazûmana dewletê ya weşanên televîzyonê girîng e ku em li Kurdistanê qedexe bikin. Yekîtî û tifaqa gel tu hêz û tu quwet nikare bide erdê, ez mînakekê ji we re bidim; di sala 1988 an de li **Arjantînê** di bin serokatiya **Aldobîro** de xwestin ku darbekê çêkin, lê bi rêxistina gel di bin serokatiya **Alfonsîn de**, darbekar bela wela bûn, ji hêz û tifaqa gel darbekar nikarin xwe li ser linga bihêlin, li Tirkiyê jî rêxistinek wisa pêwist e, girîng e ku gel wisa bi rêxistin bibe, ku êdî li Tirkiyê jî darbekar nema karibin serê xwe rakin.

Ez ji **Rojnameya Welat** hêvî dikim ku van gotinên min ê dawî jî biweşîn e, ez cardin gazî mebûsên Kurd, **Fehmi Işıklar**, **Adnan Ekmen**, **Salih Sümer**, **Atila Hun**, **Muzafer Arıkan**, **Esat Canan**, **Şeref Bedirhanoğlu**, **Melik Fırat** û yên ku navê wan nayên bîra min û mebûsên demokrat yê Tirk dikim û em li hêviya wan in.

**Piştî vê hevpeyvînê ÖZEP xwe fesih kir û bi HEP ê re bû yek.**

***Hevpeyvîn: Ş. Arjen***

---

*Sosyolog Dr. İsmail Beşikçi:*

# 'Mehkemekirina dîtin û ramanê qebûl nakim'

**Enqere-Welat**



*İsmail Beşikçi*

Êdî ji şerê çekdarî pê ve tu rê û mecal ji Kurdan re nemaye...

Celse (nişîn)ek tenê têra Beşikçi nema dike. DGM a Enqerê, rojeke mesaiyê bi temamî ji dadgeha **Sosyolog Dr. İsmail Beşikçi** re veqetand.

Dewlet di hêlekê de ji demokrasî, mafên mirovan, azadiya dîtin û ramanan diaxive, di hêla din de jî, dîtin û ramanên mirovan qedexe dike, bi dîtin û ramanên cûnta, mêjiyê mirovan mifte dike.

30.6.1992 an de li DGM a Enqerê dadgeha rewşenbîr **Sosyolog Dr. İsmail Beşikçi** û xwediyê **Weşanên Yurt** (Yurt yayın evi) **Ünsal Öztürk** destpêkir, hêzên dewletê derdorên DGM ê kirin xelek. Di destpêka dadgehê de mebûsê Partiya Azad û Wekhevî yê **Adiyemanê Mahmut Kılınç**, piştî nîvroyê jî, mebûsê Şirnex **Orhan Doğan**, **Mahmut Alınak**, yê Wanê **Remzi Kartal**, **Muzaffer Demir**, yê Batmanê **Nizametin Toğuç**, **Sedat Yurtdaş**, **Sırrı Sakık** û yê Mêrdînê **Mehmet Sincar** di hêla temaşegeran de cih standin.

Di mehkemê de İsmail Beşikçi parêzname (savunma) ya xwe wiha kir:

Hebûna Kurd û Kurdistan, Bûyera Kurd û Kurdistan, Pirsgirêka Kurd û Kurdistan, di Rojhilata Navîn û tevaya Cîhanê de cihekî zehf girîng digire, îdeolojiya resmî li hemberê navê Kurd û Kurdistanê ye, îdeolojiya resmî ne hemdemî ye, li dijî hemdemî û mirovahiyê ye, îdeolojiya resmî, înkara ilm û hemdemiyê ye.

Em dibêjin ev qedexe ne meşrû ne, ne rast in, ev qedexe, te divê bila bi destê 5 generalan, te divê jî, bi qerara 450 mebûsan be, tu meşrûiyeta wê nîne, lewre, tu dîtin û raman nabe sûc.

Kurd û Kurdistan heye, divê înkara vê neyê kirin, çawa Kurdistanek İraqê, Îranê, Sûriyê heye, Kurdistanek Tirkiyê jî heye. Em tiştê rastî tînin ziman, em tiştekî nû îcat nakin, ji ber ku ez dibêm Kurdistan heye û gelê Kurdistan di bin zilm û kotekiyê de ye, dîtin û ramanên min û pirtûkên min têne qedexe kirin, îdeolojiya fermî, dixwaze mêjiyê min mifte bike, belê bi saya têkoşîna neteweya Kurdistan ne karin mêjiyê min ne jî yê gelê Kurd mifte bikin, bi têkoşîna neteweya Kurdistan îdeolojiya resmî hatiye pelixandin, gelê Kurd qereqolên di serê xwe de hilweşandine.

We bihîstiye ku Kurdan gotiye "Kurdek bi tenê bedelê tevahiyê dinyayê ye" ji ber ku Atatürk nîjadperest e, ev şîar (slogan) avêtiye, lê Kurd û serokê Kurdan wisa nabêjin û ne gotine, hew bi tenê armanca wan ew e, ku ew jî weke gelên cîhanê bi rûmet, azad, xwedî heq û maf bijîn.

Hûn dixwazin min ceza bikin, dixwazin serbest bikin ez dadgehê we nahesibînim, ew li ba min ne lê ne. Hedefa dewleta Tirk qirkirina gelê Kurd e, roj nîne ku 2-3 mirovên Kurd nayêne qetilkirin, qirkirinek bi sosret (ecêb) bi serê gelê Kurd ve tînin, ji ber vê yekê ez dibêjim tu çare û nefera gelê Kurd ji şerê çekdarî pê ve nemaye, lewra dewletê riya demokrasiyê li ber wan girtiye.

Dema İsmail Beşikçi got "Ez naxwazim di dadgeha we de bêm mehkemekirin, dadgeha we li ba min ne lê ye" hingê serokê dadgehê jê pirsî hûn dixwazin li ku derê bên mehkemekirin." İsmail Beşikçi wiha bersiv da: "Ez naxwazim li tu derê ji bo ramana xwe bêm mehkeme kirin."


Xwediyê weşanxana Yurt, Ünsal Öztürk jî wiha got: "Bi danheva pirtûkan xuya ye ku dewlet ji pirtûkên Beşikçi ditirse, em ji bo çi li vê dadgehê ne, bi sed mîlyonan cezayên pera ji me re hatiye, qey me qaçaxçîtî kiriye? Me heşîş firotiye? Me ticareta pîrekan kiriye? Me qirkirina Zonguldakê kiriye? Me gundên Kurdan bombe kirine? Me çiya û deviyê wan şewitandine? Me zarok, keç, kal û pîr di îşkencexanan de derbas kirine? Me bi hezaran mirov binçav kirine? Me qirkirina Newrozê kiriye? Me bi sedan şoreşger daleqandine? Mesûlê 12'ê Îlonê qey em in.

Beşikçi ji bo weşandina pirtûkên xwe jî wiha got: Ez şanaz û dilxweş dibim, ev ji bo min rûmet e, ez dadgeha we û qanûnên we nas nakim, qerarê a we ji bo min ne girîng e, ez dixwazim, weke her gelê cîhanê, gelê Kurd jî qedera xwe bi destê xwe tayîn bike, azad û serbest bibe.

Dadgeha Beşikçi cardin dirêj û taloq kirin...

# Zozanên Kurdistanê tev mêrg û çîmen in kanî û rûbar in

**● Gelê Kurd li hember dijmin çawa li ber xwe dide û ji nû ve xaka xwe ava dike. Ma ji vê xweştir, bilindtir, bi rûmettir û qiymettir tiştek heye? Em dibên na, na, na! Tiştê tewra bi rûmet û qiymet ev e ku mirov vegere ser xaka welatê xwe û bi welatiyên xwe re qedera xwe bike yek û li hember dijmin serî hilde.**



*Zozanên welatê me gelekî xweş in, lê bi hebûna gerîlayan hîn xweştir dibin û bi hebûna şivan û pez û keriyan jî geş û şêntir dibin.*

**Şervan**

Me bihîst ku hinek gundiyên ku ji ber zordariya dijmin, ji Botanê dûr ketibûn, vedigerin ser xaka xwe. Bi bihîstina vê xeberê em gelekî kêfxweş bûn û em hêvîdar in ku hemû welatiyên me, yên ku ji xaka xwe dûr ketine, berê xwe bidin welatê xwe û bên mal û gundên xwe ji nû ve ava bikin û dest bi jiyanek nû bikin.

Dema ku dijmin zozanên Botanê vala kirin ez li wir bûm û min zilma dijmin bi çavên xwe dît. Sala 1990 an bû; dijmin bi hişkayî dest bi valakirina zozanan kir, Zozanên Botanê di navbera bajarên Şax (Çatak), Berwarî (Perwarî), Elk (Beytüşşebap) û Qilaban (Uludere) de dimînin. Berya ku dijmin vala bike, her sal bi destpêka bihara zozanan re, gelê deştê pezên xwe didan ber xwe û berê xwe didan zozanan. Li deştê bihar zû dest pê dike û havîn jî zû tê. Dema ku li deştê dinya dibe bihar, li zozanan hîn zivistan e û berf li erdê ye û dema ku li deştê giya zer dibe, li zozanan berf nû dihele û giya serê xwe ji bin berfê derdixe.

Giyayê zozanan pirr hêşîn û teze û tam xweş e. Li zozanan bi hezaran şiklê giya hene û bi qasî bejna însanan dirêj dibin. Dema ku berf dihele û giya bilind dibe, deştî jî dighên zozanan û bi mehan li wir pezên xwe diçêrînin. Dema ku li deştê dibe havîn û havîn xelas dibe jî, li zozanan hîn giyayê şîn û teze hene...

Berya sala 1990 an pez û kerî li zozanan belav dibûn û bûk, qîz, xort, pîrek û zarokên cilên wan rengûrengîn zozan dadigirtin û şên dikirin. Xort li ser hespan diçûn nêçîra kewan û kûviyan...

Giyayên zozanan bi xwarina pez û keriyan kêfxweş dibûn û hîn bêtir qama xwe bilind dikirin û şaxên xwe zêde dikirin û tama xwe teze dikirin... Pez û kerî jî pirr kêfxweş dibûn ku dihatin zozanan nava giyayê her şikil û teze û ew ava sipehî û hênik... Tev dixwarin, vedixwarin û dikirin şîr û kar û berx didan gundiyan.

Gundî jî, bi hatina zozanan pirr kêfxweş dibûn, ji ber ku ew çiyayên bilind û hênik û hemû mêrg û çîmen bêhna wan fireh dikir. Pezên wan bi saxlemî dizan û ji şîrê wan gelek mast, penêr û nivîşk çêdikirin. Giyayê zozanan tev li penêr dikirin û penêrê wan xweştir dibû.

Gundiyên ku diçûn zozanan kêfa wan ne tenê bi zêdebûna pezên wan û xweşiya zozanan dihat, lê pirrayî bi dîtina gerîlayan dihat. Dema ku sîh- çil û car caran sed-dused gerîla tev bi çek û rextan bi hev re didîtin, pişta wan qewîn dibû, xwe azad û serdest û dilşad didîtin. Bi gerîlayan re li dora agirên şivanan rûdiniştin, çaya germ vedixwarin û li ser pirsên welatê xwe diaxivîn... Hem mejiyê wan, hem çavê wan vedibû û hem şa dibûn. Bi vê sedemê rojekê ku gerîla nedîtibana li hespên xwe suwar dibûn û gelî bi gelî li wan digeriyan ku li cem wan rûnên û li axavtinên wan guhdarî bikin.

Bi rastî zozanên welatê me gelekî xweş in, lê bi hebûna gerîlayan hîn xweştir dibin û bi hebûna şivan û pez û keriyan jî geştir û şên dibin.

Dema ku dijmin dît têkiliyên zozanvanan bi gerîlayan re çêdibe û gelê li zozan roj bi roj bi Partiyê ve tên girêdan û têkiliyên xwe jî dijmin qut dikin, berê xwe dan zozanan. Di sala 1989 an de, ji zozanan bi sedan xort tevlî refên ARGK'ê bûn û gelê zozanan hemû, ji gerîlayan re bûbûn milîs û ji bo welatê xwe kar û xebat dikirin... Dijmin ji pêşkevtina wiha xurt û tevayî pirr tirsiya û êriş birin ser zozanan.

Dijmin dît ku bi şerê leşkerî tenê nikare zozanvanî û zozanan ji gerîla dûr bixe. Bi vê sedemê di destpêka sala 1990 an de bi hezaran leşker û bi sedan tîm û gelek top û çekên giran bir zozanan û dest bi operasyonan kir. Di van operasyonan de, ne ku li hember gerîla şer dikir.. Na, newêribû nêzîkî gerîla bibe. Bi ser gundiyên bê çek û şivanên reben ve çû. Pêşî hatina zozanan li deştiyan (domaniyan) qedexe kir. Riya wan girt û nehişt ku herin zozanan. Ewqas pez wê salê li deştê di hewşan û şikeftan de man. Ne giya hebû û ne pere hebû, ku ka û ceh bikirrin. Mecbûr man ku pezê xwe bifroşin û pezên gelek kesan jî telef bûn. Aboriya wan qels ket û ji hêlekê ve ji mecbûrî û ji hêlekê ve jî, ji ber zora dijmin berê xwe dan metropolên Tirkiyê.

Dema ku wiha nexweşî bi serê gelê deştê ve dihat, dijmin li zozanan jî dest bi şewitandina daristanan û valakirina gundan kir. Bi hezaran leşker ketin nava daristanan û qutîkên konserweyan tije nift û mazot kirin û berdan qulên daran û agir berdanê. Bi rojan û bi şevan ji daristanan agir û dûman qut nebû. Bi hezaran û bi milyonan teyr û sewalên kûvî di nava vî agirê neyar de şewitîn û bûn xwelî...

Dijmin ne tenê daristan şewitandin, lê ji daristanan xerabtir bi serê gundan û gundiyan de anîn. Bi kotek, lêdan û îşkenceyê gundî ji malan derxistin û sirgûn kirin, piştre nift û benzîn û mazot valakirin hundirê xaniyan û mal û axo û kadîn tev dan agir. Bi şev û rojan gund wiha şewitîn û agir û dûman ji ezmanên zozanan qut nebûn. Dijmin wisa bi lez dest bi şewitandina gundan kir ku gundiyan fersend nedidît firaxên xwe, hûr-mûrên xwe û sewal (heywan)ên xwe xelaskin û ew jî di nava agirê neyar de şewitîn. Dema ku tu nêzîkî wan gundan dibûy, bêhna hirî û pezên şewitî difina (bêvila) te disot...

Gundiyên ku bi vî awahî sirgûnî bajaran bûn. Hinek ji wan li bajarên welat man û hinek ji wan jî berê xwe dan metropolên Tirkiyê..

Ew kesên çûn metropolên Tirkiyê, li wê derê bê kar û bê xebat man ji ber ku gelên Tirkiyê bi xwe bê kar û bê xebat bûn. Dijmin mecala kar û xebatê nehiştibû. Û yek din jî ew kes hînî hewa zozanan bûbûn. Ew bêhna zozanan a binevşîn û ew ava wê ya hênik sipehî bedenên wan kiribû wek pola. Mirovên zozanan hînî jiyana azad bûbûn. Ku her roj li serê du-sê çiyan negeriyana debara wan nedihat... Lê li bajaran ev îmkan tunebûn. Di gecekondiyan de, di xaniyên teneke de, di nava toz û gemarê de û li ber bêhna dûmana tremplan û kargehan (febrîqeyan) rojek têr û deh roj birçî, zû ji qeweta xwe ketin û birrek ji wan li ser hevdû nexweş ketin. Pere yên wan tunebû ku biçin textorên taybetî çûn ber deriyên nexweşxaneyên dewletê, ji ber ku feqîr bûn, ziman nezan bûn û bê xwedî bûn kesî guh neda wan û li ber deriyan belengaz man. Hinek ji wan li ser kaldiriman can dan û heta ku bûn bi laşê wan neket, belediyê nehat laşê wan ji wir ranekir...

Belê dijmin wiha bi serê zozanvanan ve anî. Heta ku mirov bi çavan nebîne mirov bawer nake... Gelê zozanan ên ku çûn metropolên Tirkiyê jî, ev rewşa neyar bi çavan dîtin û ji xwe re gotin, "Bila em bimrin, lê ne li ber deriyên dijmin; li ber deriyên welatê xwe û li ser xaka xwe bin."

Çend hûr-mûrê wan ku hebûn kirin buxçik û rahiştin zêç û zarokên xwe û vegeriyan ser xaka xwe. Dîtin ku rewşa li welatê wan, çiqasî di bin zilm û zordariya dijmin de be, dîsa jî, ji rewşa li ber deriyên dijmin çêtire.

Mirovên wan li wana xwedî derketin û nanê qirika zarokên xwe li wan par kirin, cih dan wan û alîkarî dan wan ku mal û gundên xwe ji nû ve ava bikin...

Belê hîn zom û gov şên nebûne... Pez û kerî hîn bi hisreta zozanan in... û giyayên zozanan wiha sitûxwar li hêviya kar û berxan in... lê roj bi roj zozanvan vedigerin ser gund û malên xwe û bi mirin û mayin bi xaka xwe ve tên girêdan... Ev nîşana iflaskirina vê polîtîka ya dijmin e, û ketina dijmin e. Ev nîşana ji nû ve avakirina welat û war e. Ev nîşana avabûna welatperwerî û welatparêziyek xurt li ser xaka welat û di nava gelê Kurd de ye...

Belê dema me bihîst ku zozanvanên welatê me vegeriyane ser xaka xwe û bi gelê xwe re qedera xwe û jiyana xwe kirine yek, ev hatin bîra me. Me bi çavên xwe dît, bê dijmin bi çi zilm û zordestiyê zozan vala kirin û şewitandin, îro jî, em bi çavan dibînin ku gelê Kurd li hember dijmin çawa li ber xwe dide û ji nû ve xaka xwe ava dike. Ma ji vê xweştir, bilindtir, bi rûmettir û qiymettir tiştek heye? Em dibên na, na, na! Tiştê tewra bi rûmet û qiymet ev e ku mirov vegere ser xaka welatê xwe û bi welatiyên xwe re qedera xwe bike yek û li hember dijmin serî hilde.

# Jin û mêr tevr û bêr

**● Miletê Kurd ji hebûna xwe û heta îro tu ferq ne xistiye nav pîrek û zilaman. Li gora Kurdan, "Şêr şêr e; çi jin e, çi mêr e. " Ji vê gotina pêşiyan jî tê fêm kirin; li cem Kurdan jin û mêr yek in. Em karin bêjin, wekheviya zilam û pîrekan, di nav miletên musulman de, hew li cem Kurdan tenê heye.**

**● Pîrek li cem Kurdan bi qîmet in, bi rûmet in. Xweseriya pîrekên Kurdan li kêm civatan hene. Kurd di hêmû çaxan de pîrekên xwe azad hiştine, gelek civat û miletên dinyayê di van salên dawî de û hinekan jî di serê sedsalê de serbestî û serbixwetî dane pîrekên xwe.**

**Dîcle Ferad**

Miletê Kurd gelek rûmet daye pîrekên xwe. Di dîrokê de, di jîna (heyata) Kurdan de gelek pîrekên ku serokatî li êlên, eşîrên, civatên Kurdan kirine, hene. Di nav miletê Kurd de gelek pîrekên bi nav û deng hene; ev nav û dengê wan, mêrxasî û egîtiya wan li temamê welêt belav bûye. Gelek mezinên Kurdan, pêşketiyên xelkê, ji ber ku diya wan bi nav û deng bûn, bi navê dayikên xwe tên naskirin.

Gelek tesîrên dînê îslamê li ser gelê Kurd bûye. Di hemû waran de Kurd di bin tesîra musulmantiyê de mane. Bi riya dînê îslame gelek adet rabûn û rûniştinên Ereban ketine nav Kurdan. Lê em bi hêsanî karin bêjin, tesîra musulmantiyê li ser pîrekên me û têkiliyên bi pîrekan re kêm e. Gelek caran hatiye nivîsandin, pirr caran tê gotin û herkes jî zane; îro di nav xelkê me de pîrekên me wek zilaman serbest in, xwe na nuxumînin û xwe ji ber zilaman venaşêrin. Ev adet û serbestî ne li nav Ereban heye û ne jî li nav Tirkan. Kincên pîrekên me jî, ku mirov bala xwe bidê , ne kincên xwe xumandinê ne. Dîsa baş tê zanîn; îro jî pîrekên me, dayikên me, bi rihetî di nav civatekê de eşkere şîr didin zarokên xwe û tu kes jî eyb nabîne; ev rewş ji pîrekên me re ne kêmasî ye. Ji xwe bala tu kesî jî nakşîne, ev tişt xwezayî ye, normal e.

Miletê Kurd ji hebûna xwe û heta îro tu ferq ne xistiye nav pîrek û zilaman. Li gora Kurdan, "Şêr şêr e; çi jin e, çi mêr e. " Ji vê gotina pêşiyan jî tê fêm kirin; li cem Kurdan jin û mêr yek in. Em karin bêjin, wekheviya zilam û pîrekan, di nav miletên musulman de, hew li cem Kurdan tenê heye.

Di çanda xelkê me de gelek gotinên pêşiyan li ser pîrekan, li ser jin û mêran hene. Yek ji wan ev e: **"Jin û mêr; tevr û bêr."** Çawa ku tevr (kazma) û bêr (kürek) hevdû temam dikin; yanî mirov incex bi tevr û bêrê karibe karekî bike, jin û mêr jî wilo ne; yanî hevdû temam dikin, herdû bihev re karin tiştekî bikin.

**"Jina malê binyada xênî ye."** Ev gotina pêşiyan ji me re dibêje, ku pîrek ne li malê be mal bi kêrî tiştekî nayê û li ser lingan jî namîne.

Her gotinek pêşiyan di demekê de hatiye gotin û tevde bi serê xwe ne. Yanê ne bê sebep hatine gotin. Ev gotin ji jîna Kurdan hatine derxistin û gelek tiştan ji me re dibêjin. Gotinek pêşiyan wilo ye: **"Jina şermîn bi mileteki, mêrê şermîn bi kiraseki."** Ev gotin li hin deverên welêt wiha jî tê gotîn: **"Pîreka fedîkok bi gundekî, zilamê fêdîkok bi kundekî."** Şermkirin, fedîbûn çiqas ji pîrekan re baş be, ji zilaman re jî kêmasî ye. Yanê zilam divê ji pîreka bêtir bi xebitin, li pêşkevin, ji kar şerm nekin. Di civatan de ne bêdeng û çilmisî bin. Di van gotinan de pêşiyên me, giranbûna pîrekan şanî me didin. Dibêjin pîrek çiqas giran bin ewqas baş e. Fedî kirin, şerm kirin, ji pîre kan re xeml û xêz e.

Jin û mêr carna li hev in, carna jî, nav wan ne xweş dibe. Di jiyana jin û mêran de pevçûn dibe, dilmayîn dibe. Pêşiyên me gotine, "Di nava jin û meran de ne peyivin." Bi gotinek din: **"Nekevin nav jin û mêran"** Lewra ew pev biçin, şer bikin jî, jin û mêrê hev in; wê kêlîkek din ji ber xwe ve li hev bên. Fitneyî û gotinguheztin bi kesî din nakeve.

Hemû pîrek ne wek hev in. Hemû mêr jî ne wek hev in Pîrekên qenc, bi namûs, egit û jêhati hene, yên ne baş jî hene. Zilamên newêrek, derewîn, bêbext hene, yên mêrxas, camêr, jêhatî û mêr jî hene. Gotinek pêşiyan li ser cure cureyî ya jin û mêran e: **"Jin hene jinkok hene" yan jî "mêr hene mêrkok hene"** Ji ber vê yekê jî pêşiyên me gotine : **"Li jinê bigere wek reha rûnyê."** Rûnya, giyayek e, reha wê dermanê birîna ye, kêm peyde dibe. **"Jinê bîne ji esliya, tê bibîne ecêbiya."** Jinê bi esil, ji ber ku ji malên mezin in, gelek adetan zanin, tiştên nedîtî zanin û van tiştan bi xwe re tînin malên xwe.

Gotinek din jî wiha ye: **"Jina çê mirov dike wezîr, jina xerab mirov dike rezîl."** Ma hewce ye ku em tiştekî li ser vê gotina hêja bêjin? Ma ne wilo ye?

Bi kurtasî: Pîrek li cem Kurdan pirr bi qîmet in, bi rûmet in. Di nava miletên musulman de kes wek Kurdan qedr û qîmet ne daye pîrekên xwe, serpêhatiya, xweseriya pîrekên Kurdan li kêm civatan hene. Kurd di hemû çaxan de pîrekên xwe azad hiştine, gelek civat û miletên dinyayê di van salên dawî de û hinekan jî di serê sedsalê de serbestî û serbixwetî dane pîrekên xwe. Ji bo kesê ku di vî warî de tiştan binivîse yan jî lêkolînan bike, ezê bi çend gotinên pêşiyan nivîsandina xwe biqedînim:

**Jin keleh e, mêr girtiye.**
**Dê bibîn, dotê werîn.**
**Jin çûn hewara, mêr ketin kewara.**
**Dê û dotê şer kirin, kêm aqilan bawer kirin.**
**Zilam ji pîrekê, gayê cot ji çêlekê.**



*Îro di nav xelkê me de pîrekên me wek zilaman serbest in, xwe na nuxumînin û xwe ji ber zilaman venaşêrin.*

# Apotiyê 35 mîlyon Kurd ji "Aşbetaleke" xelas kir PKK'tiyê Serok Apo an kiştiş ra xelas kerd

**Mamo Cûmî**

"Şêx Seîdperwerek li pozê çiyayekî Kurdistanê rûniştiye û wisa delê: "Şarê Kurd, eger şima biwazî serxwebûna xwe biresî, dest bidî partiya xwe, PKK Şima poşman nê benî, ji ber ku esparê estorda şarî tim peye yo".

Di navbera dawiya şerê Golfê û perçekirina Yûgoslavya de qedera 35 mîlyon Kurd tê re derbas bû. Ev qedera hanê li ber aşbetaleka dinê bû. Eger em li bûyerên nakok (dij-hev) li dinyayê ji hîngê de hûr binêrin ku çawa Faris bûne hembazên (heval) îngilîzan, Rûs bûne hembazên Amerîkiyan, cihû bûne hembazên Almanan, Ereb bûne hembazên Firansizên De Gaulle û hwd... em dikarin bibêjin ku bi saya Apotiyê, 35 mîlyon Kurd ji aşbetalekê xelas bûn, an PKKetiyê Serok Apo kiştiş ra xelas kerd.

Pêna (gava) ku armancên "New World Ordre" ji gelan ve eşkere bûn, çapemeniyê li dinyayê henek û rexnên xwe li hevoka "New World Ordre" kirin û bi Latînî jê re gotin "Pax Americana" (Aştiya Amerîkî). Bi gotineka dinê, çapemeniyê dixwest bigota ku "Aştiya Amerîkî" ji şer pê ve tiştekî dinê ji gelan re neanî. Vêga, ji bo Kurdan tu tişt ji Apotiyê û PKKetiyê rasttir, xembartir û bi rûmettir nîne. **A ya ku kê bikero xwe, yewer nişno bikero kê.**

Roja ku Astiyaj (584-550 Berî Zayînî), paşayê dawî yê Medan, ji berjewendiyên xwe yên pirr kesane (şexsî) tirsiyayî û qîza xwe, Mendan, dayî Kambîzê Faris, ji hîngê de Kurd û Kurdistan paksekê (pax) li ser paksekê dibînin. Paksek diçe, yek tê. Her paksekê mêrok, kespik, zengilk û xirxirkên xwe hebûn, xwe pê dixemilandin, wekî dinê, armanca tevan talankirin û dagirtina Kurdistanê bû. Ereban navê "pax" a xwe lê kirin "îslam" (ango, destên xwe hildin jor, hûn mirin); Bolşevîkan nav lê kirin "Komonîzim" (ango, bibin Rûs, Ereb, Tirk û Faris); G. Bush nav lê kir "N. W. O." (ango, dewletina kolîdar bişatin, hineka nû çê bibin). Kurt, qertel li deran şer dikin, tên li ser laşên Kurdan li hev tên, çima ku armanca wan ne ew bi xwe ne, lê nêçîr e. Wiha, bi van "pax" Şan Kurdistan wêran bû. Ji hîngê de, trajîdiya Kurd û Kurdistanê trajîdiya Kela Dimdimê ye. Vê carê, "Pax amêricana" bi saya Apotiyê cihê xwe di nav Kurdan de ne dît, nikarin Kela Dimdimê vekirana.

"Pax" bi xwe lîska şeşrengê (chess, échec) ye. Gava kê (mirov) bixwaze vexwe, divê Paşa were kuştin. Çaxa dijminê me xwestine tevgereke Kurdî pûç bikin, çavên xwe bi hêza xwe gişkî berdidane serokatiya wê tevgerê. Dîroka me ji van nimûnan dagirtî ye; tim xwestine serokên me bikujin. "Pax américan" di, PKK çi mal a ameya sereşnayîş. "Partiya raştikên rojo teng di diyar bena", delê pendeka Kurdî.

Eger gewrehêzên "New World Ordre" bikarîna serokê PKK, Abdullah Öcalan, bixapandana û bikirana mêvanê xwe, li çend "restaurant" -ên Moskovayê, Bonê, Parîsê, Waşintonê, û hwd... bigerandana, tembûra "Liberty" (azadî), "Droits de l'Homme" (mafên mirovan) û "mîrolyobîvî narodî" (gelên aştîxwaz) lêxistana, wê roja îro serê PKK bi wan gerek bûya. Bi gotineka dinê, roja ku berjewendiyên wan bihatana ber, ê mêvandar wê zû çavên xwe berdaya mêvanê xwe. Tiştên ku mêvandarên Ewrûpî li ser kuştina Dr. Qasimlo nivîsandine ev e: "Bavê te siwara kuşt, peya kuşt, li pey me keve, lê mepirse."

Gava G. Bush çûyî Tirkiyê, gunehên wê di avê de berdanî da ku, li şûna vê yekê, dewleta Tirk piştgiriya Amerîka ji A ra (ta) Z bike, eger hîngê PKK jî xwe avêti bûya "bextê" wan, ev seredana hanê giş ne gerek bû. Necamêran dikarîn bi hêsanî li kevirên şeşrenga xwe binêrîna, kevirê PKK bilivandana û bikuştana. Wiha, PKK ji lîskê derdiket. Encamên vê derdanê (xisar) wê çi bûna Jû? Eger Dewleta Tirk niha bi roj piştgiriya Amerîka dike, wê bi şev jî bikira. Didu, şerê gerîla çiqasî bi şon diket, kesek nizane. Hîrê, îro bi saya têkoşîna çekdarî ya PKK Kurdên li Başûr jî xwedî giranî ne, ew giranî jî dicû. Çar, gewrehêzên Rojava îro rûyê wan reş bûne ku çima Kurdina di ser Kurdina re digrin. Medya dijminên "N.W.O." îro ew çêra şerê çekdarî yê PKK dibin, ên dinê ne tenê xwe li ser kerr dikin, lê vedişêrin jî. Çaxa ku pê gerek bin, wekî mesela wezîrê Almanî, hîngê hêvanê meyandina mastê wan "Kurd" in. Ponc, ev çend gotinên min ên Kurdî dernediketin, ji ber ku "Welat" wê tavilê bihataya girtin.

Vêca, eger karî bûna serê Serok Apo peyda kirana, Dewleteke Tirk a xurt li Rojhilata Navîn li dijî Farisan û Ereban ji wan re çêtir bû. Lê, Apotî ji evqas dersên dîroka me ya bi şîn za ye, çem e û diherike. Bi saya PKK'etiyê Kurd ji lîska şeşrengê derneketin. Dimdim êdî ne bi xinizên mîna Hikmet Çetin, ne bi talankerên Tirk, Faris û Ereb, ne bi alîkariya Major, Bush û Mitterrandê şarî, nayê vekirin. Vaja, şêniyê Dimdimê li ser rêya serketinê ne. "Di destpêkê de, hevalekî me şehîd ket, me çi kir? Me PKK damezrand. dema ku hevalê Kemal û Mazlûm şehîd bûn, me gava 15'ê Tebaxê avêt. Dema ku hevalê Egît jî şehîd ket, me Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê ava kir (...) Dema ku komeke gerîla li Mêrdînê şehîd ketin, me serhildanek çêkir (...) Di destpêkê de kêreke me tune bû ku em pê li dijmin bidin, niha hûn dibînin ordiyeke ku dinya tev pê re, nikare li hember gerîlayên artêşa me derkeve, nikare rojekê tenê jî li hemberê me bisekine (...)", delê Serok Apo (Welat, hej. 16, binêrin).

Anegora deyîşê ma, Kurdekanî çiwar beşî Kurdistan, eger êwe hez dekeyn bo xo "Estat Kurdica" (Dewleteke Kurdî) ava bikeyn, gerek o PKK biba yew Partiya Kurdistanî. Gerek e nimûneyên gundên "Bêlê"-Efrîn pirr bibin.

# Dewlet, siyaseta krizê û têkiliyên derve

**Cumalî Cotkar**

Siyasetek kevneşop (klasîk) heye ku pirr caran gelek dewlet, bêrî ku sedem hebin, dest davêjinê û dixwazin bimeşînin. Bi gotineke din, demên ku krîzên siyasî û aborî li hundir, li dij dewletan atmosferek têkoşer û potansiyelek gelêrî yan jî girseyî pêk tîne, dewlet, ji bo ku bikaribin raya giştî bixapînin, yan jî pirs û pirsgirêkên gel, ji bîr ve bibin û çav û ramanên wan ji meselên esasî bi dûrxînin, bi kar, xebat û siyasetên hîn "girstir" û "girîngtir" ve mijûl dibin.

Dewleta Tirk jî gelek caran dest avêtiye vê siyaseta klasîk. Îcar dewleta Tirk him bi vê siyasetê ve mijûl dibe, him jî pê re siyaseta xwe ya kotekî li ser gelê Kurd didomîne. Ji bo dewletê metoda yekemîn, ji bo veşartina metoda duyemîn dibe wasitek.

Bi kurtî em li rewşa îro mêzekin: Li aliyekî gelê Kurd şerê xwe yê neteweyî dimeşine û bi gavên girs mewziyên girîng bi dest xwe dixe. Li aliyê din dewlet him şerekî gemarî dimeşîne, him jî bi hemû rêvebirên xwe li derve bi pirsê din ve mijûl dibe ku xwe di şerê hundir de bi heq derxe. Ji bo vê xwe dixe bazarê û difroşe. Rêvebirên dewletê yan li derve ne yan jî ji derve mêvanên wan hene.

Geh li Amerîka û Ewrûpa, geh li Amerîka latîn û Qafqasya ne. Çûyin û hatineke ecêb heye. Tu dibê qey dawet e, yan jî her roj şîn e. Di van şeş mehan de qasî ku mirovên vê dewlete li balafiran suwar bûne, seroken Amerîka û Ewrûpa, deh salan ew kar nekirine. Ev siyaset ji bo çi ye? Sê sedemên van têkiliyan hene. 1. Dewleta Tirk dixwaze bigihîje qonaxa ku Ewrûpa îro tê de ye 2. Dewleta Tirk dixwaze bi dewletên din yên Tirkî mezin û fireh bibe. 3. Dewlet bi meşandina van herdu siyasetan dixwaze pirsa Kurdan li gor xwe, bi darê zorê hal bike.

Bi kurtî mirov dikare li ser xala dawîn çend gotinan bibêje: Çûyin hatina mirovên dewletê bi mesela Kurd ve girêdayi ye. Dewlet bi van têkiliyên derve ji bo siyaseta xwe ya faşist li alîkar û alîgiran, digere. Mirov dikare sedemên vê gerê di çend xalan de kom ke:

Ji bo ku siyaseta dewletê, ji bo çareserkirina pirsa Kurdan tune ye. Ew ji pirsa herî girîng a dewletê direvin. xwe berpirsiyarê vê pirsê nabînin. Bi vî awayî rêvebirên hikûmetê dixwazin xwe ji şerê taybetî yê generalan dûr nîşan bidin.

Pê re jî kontra û Hîzbullahên xwe xurt dikin û dişînin ser gelê Kurd. Vê jî bi zanebûn rasta vê dema têkiliyên derve tînin. Ji bo ku di pêşerojê de xwe bê sûc derxin. Ewê bikaribin bibêjin "Em li derve bûn. Generalan qetlîam dikir. Xebera me jê tune bû"


Bi vê çûyin û hatinê dixwazin xwe di sewiya dewletên modern ên Ewrûpa de bibinin û xwe wisa ji bo dewletên din nîşan bidin. Yanê ji bo ku Tirk jî wek Ewrûpa ji heqê mirovatiyê re hurmet dikin, kî çi dibê bila bibêje dewleta Tirk metodên xirab bi kar tîne.

Di vê dema çûyin û hatinê de, dewlet çûyin û hatina xwe, ji bo raya giştî dixe rojevê û pirsa gelê Kurd di rojevê de dikeve xalên jêrîn. Pê re jî metodên dewletê deh car hovtir dibin. Ev jî, di siya têkiliyên derve de, di çapemeniyê de cih nagrin. Bi vî awayî jî dewlet dixwaze pirsa me, qetlîamên dewletê wek nebûyî û ne girîng nîşan bide û xelke bixapîne. Têkoşina gelê Kurd ku roj bi roj xurtir û bilintir dibe jî, ji gelê cîhanê tê veşartin.

Lê tiştek heye. Ev çûyin û hatin dê rojekê biqede!

## XAÇEPİRS

Amadekar: Rasto Zîlanî



**Çeperast:** 1-Bûka Newrozê, di sala 1990 an de, li bircên Diyarbekir xwe şewitand, di wênê de tê dîtin 2-Eşq, sewda/ Berhemê rez/ Tamar, kok 3-Sembola Neodyûmê/ Bi erebî fêkî/ Li hember sûc û qebehetan tê dayîn 4-Dezgeh, sazî/ Di cotkariyê de darê ku davêjin stûyê gayan 5-Behîvok, argûşk/ Navê rojekî/ Di dîroka Mezopotamya de navê hukumdarekî, Daryûs 6-Pergalekî qumarê/ Sembola Kalsiyûmê 7-Bi erebî nîşan, şop 8-Xwişka Zîna dilketiya Memê/ Nakok, nerast 9-Bi zimanê biyanî melhem 10-Vexwarinek/ Bi zimanê biyanî banga hewarê

**Serejêr:** 1-Pirtûka Zerdeşt pêxember 2-Reben, belengaz/ Kinnivîsîna Lîtreyê 3-Pirsekî ji bo nasînê/ Kevirên mermer, ên biçûk û rengîn 4-Tol, heyf/ Ji Misira kevin navê îlahek 5-Cînavka kesane yekemîn/ Xwarinek şêrîn, bi helandina fêkiyan û şekir çê dibe 6-Bazirganî, dan û standin/ Di nivîsarekî de mewzû, babet 7-Mebest, daxwazî 8-Sembola Lîtyûmê/ Nexweşînekî kezebê, nefestengî 9-Plaqa Kubayê 10-Cihê gulaşa gayan 11-Bi erebî wezîr 12-Cihê hesp lê tên xwedîkirinê

**BERSİVÊN XAÇEPİRSA HEFTİYA ÇÛYÎ:**

**Çeperast:** 1-Felat/ Ferhat 2-Elem/ Dîsa/ Re 3-Qiyamet/ Meaş 4-Îdam/ Ya/ Nî 5-Êş/ Em/ Cenî 6-Tank/ Hêk 7-Eh/ Ereb 8-Aruz 9-Rav/ Hacî 10- Arîkarî

**Serejêr:** 1-Feqiyê Teyra 2-Elî/ Şah/ Ar 3-Leyî/ Avî 4-Amedekar 5-Mam/ Ruha 6-Dem/ Hezar 7-Fît/ Cêb/ Cî 8-Es/ Yek/ Tî 9-Raman 10-H 11-Aran 12-Tefîn

**NEQÛŞK**

Amadekar
Aram Çem



Riya rizgarî a gelên bindest, di lûla tivingan re derbas dibe.

*Mao Tse Tung*

# Eman hawar yeknebin!..

Li Stokholmê, piştî nîvê şevê, di navbera taxên **Rinkeby** û **Tensta** de, li ser çiyayekî bilind û li kêleka kelayek kevin (ev kela pirr dişibe Kela Wanê) û di nav daristanekî gurr û geş de partiyeke Kurdan ya din jî bi serfirazî hate damezirandin. Navê partiyê YEKNEBÎN (lê, hûn dikarin yekbûn an jî tiştekî din jî bêjin, êdî kêfa we ye) e.

Radyoya "Merheba"yê damezrandina partiyê do bi şovekî coş îlan kir. Hevpeyvîna salê do li "Merheba"yê hate çêkirin. Hevpeyvîn di atmosfereke gelek bi heyecan de dest pêkir. Muxbîrê radyoya "Merheba" yê Yawuz, di serî de xwest ku navê berpirsiyarê partiyê fêr be, berpirsiyarê partiyê wiha bersiv da:

"Navê min ji te re ne lazim e, tu kerem ke pirsên xwe bike!" Lê, muxbîr jî eks bû, dev ji navê wî berneda. Dîsa pirsî. Berpirsiyar xwe hîn jî tûj kir û got: "Ev ji bo me pirseke prensîbî ye."

Ez serê we neêşînim, xirecira li ser navê berpirsiyar dom kir. Di dawî de muxbîr Yawuz pes kir û derbasî pirseke din bû:

"Bênavê birêz, ez hêvî dikim tu bersiva vê pirsê bidî, we partî ji bo çi danî?" Bênav: "Ji pirsa te re pirseke din, ma ez mecbûr im ji te re bêjim me ji bo çi partî daniye? Bi rastî jî zimanê muxbîr Yawuz nedigeriyan, lê bi înad pirseke din jî kir:

"Di navbera we û PKK'ê de çi ferq hene?" Bênav: "Çima tu partiyeke din ji min napirsî?" Muxbîr Yawuz: "Ji ber ku partiyeke Kurdan ya din tune ye, ji ber wê. Ma tu dibêjî qey ez ji PKK'ê hez dikim. Xwezîka çend partiyên we yên din hebana!" Axir divê Bênav hin tiştan bêje û got: "Em bawerî bi plûralîzmê tînin, em bi dengan (rayan) tên ser hikum û em bi dengan ji ser hikum diçin." Muxbîrê di dilê xwe de got: "Lawo, ma em nizanin hûn ne tên ne jî diçin, lê em çi bikin heta PKK heye divê em derdê we bikşînin."

Hevpeyvîn bi wî awayî qediya. Wekî ku hûn jî dibînin bi rastî bi hevpeyvîna Bênav, mirov di derheqê partiya Yeknebin de nabe xwediyê agahdariyeke baş. Îcar ji ber ku me ev malxirab nasdikirin, me li pêşî tedbîra xwe girtibû. Nedibû ku vê bûyera ewqasî mezin em negihînin we xwendevanên quncika **Nequşkê**.

De ka bêjin me çi kir?

Belê, berî ku civîna partiya Yeknebin li kêleka kelê, (ku dişibe Kela Wanê) li dar keve, me xeber girtibû. Wekî ku hûn jî dizanin rojnamevanî ne karekî hêsan e, divê çavên mirov vekirî û guhên mirov dirêj bin. Helbet divê rojnamevan ji hin rîskan jî, hez bike. Di vê bûyerê de, hema bêjin me xwe avêt nava agir. Em çûn û me xwe li nêzê civînê, di nav daristanê de veşart û civîna Yeknebin ji serî heta dawî girt kasetan. Niha em axaftinên civînê ji we re pêşkêş bikin. Ez bawer im divê ez di serî de bêjim. Em di vê nivîsê de bi tenê axaftina serokê partiya Yeknebinê **Dîcle Firat Muradê** (Mubarek li Kurdistanê çem nehiştiye, giş ji xwe re kirine nav. Em navê serok hinek kurt dikin. D.F. Murad.) didin. Eger xwendevan pirr bixwazin mirov dikare yên mayî jî paşê biweşîne.



Bi rastî daristana kêleka kelê gelek gurr û bi heybet bû. Bêhna tebîetê mirov mest dikir. Tewir bi tewir heywanan di nav daristanê de cirît davêtin. Bayekî sar carna rûyê mirov dialast. Bi rastî jî cihê civînê mirov dibir zozanên Kurdistanê. Ji nişka ve repîna lingan hat. Min pêl da ser pişkova teyibê û ez bi heyecan li benda wan mam. Wek hercarê serokê Partiya paşenga Peyedar (ppp) D.F. Murad li pêşî û **Evdilzinar Qumrizade** jî li dûv wî bû. 12 sal e, Evdilzinar li pey Muradê dikule û diçe. Çenta D.F Murad rojek be jî, ji destê Evdilzinar neketiye. Herçî sedaqeta Evdilzinar kêm peyde dibe. Herî mehluqên sadiq jî nikarin li hemberê xwediyê xwe wiha bin.

D.F Murad çaxa ku gihîşt serê çiyê, wekî ku mirov devê meşkê berde, pûffîniyek jê derket. Helbet zehmet bû mirov zanibe ka camêr çima dipûfe. Hinek bêhna xwe da û ji Qumrîzade pirsî û got: "Evdilzinar, ev partiya çenda ne em li stokholmê avadikin?"

Ji Evdilzinar demekê deng derneket. Min texmîn dikir ku dijmêre. Feqîro neheq jî nîn e. Dû re got : "Ez ne şaş bim, ya nehan e"

D.F Murad di devê xwe de çend car hêdi got neh, neh neh. Bêguman şirova van gotinên DF Murad zehmet bû. Dikare vê hejmarê kêm bibîne, dikare zêde bibine. Ji ber ku li ba hin mirovên mezin carna qehwemehwe vexwariye, van tiştan ji wan fêr bûye. Edetê mirovên mezin e, tiştan dibêjin herkes bi awayekê din şirove dike. D F Murad bi dengê xwe yê zirav bêdengiyê dîsa xerab kir. Baş e, tu dikarî ji min re bêjî, me teşabbusê avakirina çend cephe û yekîtî û tişt-miştên din kiriye?

Evdilzinar hinek dibişire û wiha dibêje: Birê min, (gava ku ew û DF Murad bi tenê ne wiha xîtabê D.F. Murad dike) eger pirsa te teşebbus be kes nikare bi hesibîne. Ne ez, ne tu, ne jî xwedê. Na heger pirsa te ew be, ku me çend cephe û tiştên wek wî avakirine, mirov dikare bifikire. Belê , ez bawer im, di nav van salên dawî de cepheyên ku me îlan kirine, 10-12 ne. Yek- dido jî, berî ku em îlan bikin têk çûn.

D. F. Murad ber bi Evdilzinar ve çû û ji cixara xwe gulkepe dirêj û kûr kişand û bi dostanî li cixara xwe mêze kir û got: "Tecrube ye, em her roj bi tecrubetir dibin. Baş tê bîra te , beriya çend salan em bi salan nikaribûn partiyek avabikin. Lê niha, bi tenê çend rojan partî bi her awayê amade ye. Rast ê , partiyen me yên niha, ji berê zûtir belav dibin, lê, ne xem e . Navê wan dimîne. Carna Swêdî ji me rewşa Kurdistanê û ya PKK' ê dipirsin. Wê çaxê cewaba me hazir e. Em dibêjin: Li Kurdistanê 30-35 partî hene. PKK jî, yek ji wan e. Tu dibînî keda mirov ji tewşê naçe. Evdilzinar bi bextewariyeke mezin li devê serokê xwe mêze dike.

Dîsa repa-repa lingan tê. Ez qeretûna çar kesên din dibînim. Belê, ev camêr jî ne xerîb in. Yê pêşî, Bênavê Radyoyê. Ji xwe mirov ji teşqele û qelebalixa wî, wî li ser Pira Selatê jî bibîne, dînase. Bênav jî, hevalê PPP' ye. Herçiqas ew û Evdilzinar hevalên hev in ji, lê, ji hevûdu hîç hez nakin. Di eslê xwe de, Bênav mirovê van karan nîn e, lê çavê xerîbiyê kor be!

Yê dûyemîn, Kak Mulayim e. Bi rastî jî wek navê xwe Mulayim e. Kak Mulayim, bi salan e, bi serê xwe dijî. Ji tenêbûnê ecêb hez dike. Ew bi xwe ji Bakur e, lê, dilê wî her tim li Başûrê welêt, li ba Mam Celal e. Bêja nankoriyê di ferhenga wî de tune ye. Tê gotin ku li ser felsefa tenêbûnê xebatên gelek ilmî kirine. Heta ew bawer dike ku Kurdistan bi tenêbûnê rizgar dibe. Bi rastî jî Kak Mulayim di dîtinên xwe de samîmî ye. Demekê ji ber hin fikaran Partiyek daniye, lê, ji ber dîtinên xwe kesek jî nekiriye endam û ji îro pê ve jî nake. Navê partiya wî pirr rehet e: KAK. Li gor agahdariyên me, navê Yeknebin li ser israra wî hatiye qebûl kirin.

Du kesên mayîn jî, ji KUK'ê Baskê Sipî ne. Herçiqas Baskê Sipî, ji navê xwe neraziye û dixwaze wek Baskê sor bê qebûl kirin jî, lê, li taxa Rinkeby ev bask, wek Sipî tê nasîn. Ez ji we rica dikim hûn ji min ne pirsin ka çima Sipî ye. Li Swêdê wilo ye, kî bi çi mijûl be, bi wî tiştî tê bi nav kirin. Ev bask ji 3-4 kesan pêk tê û karê xwe dike. Carna dîqet nakin, serê wan dikeve derd û belan. Lê, hertim hevalekî wan paqij e. Hevalê paqij li taxa Rinkeby û Tenstayê di derheqê hevalên xwe yê girtî de, belavok-melavokan belav dike, da ku wan ji belayê rizgar bike. Axir ji her tiştê xeter re hin tedbîr lazim in. Bi belavokan dixwazin karê Sipî, sor an jî parî belek bikin.

Carna ev camêr ji Kurdên Stokholmê gazinan dikin û bi baweriya min di gazinên xwe de bi heq in. Dibêjin: "Kîjan Baskê KUK'ê (Mebest ji baskên KUK'ê, yên ku berî 10-15 salan li ser navê KUK'ê hatine Ewrûpa û bi taybetî li Stokholmê bi cih bûne û çi tiştên ku sipî be jê hez dikin. 4-5 baskên wiha hene. Her bask jî, ji 4-5 kesan pêk tê) Hûn çima ji me re dibêjin Sipî û ji yê mayîn re na?" Bi ya min jî divê mirov ji hemûyan re bêje. Neheqî û bêbextî ne karê camêran e!

*J. Diyarbekirî*

# TÎR

**Musa Anter**



## Nifûsa Tirkiyê

Ê min, ez tim nifûsa Tirkiyê dişibînim bênderekê. Li Kurdistanê li ser bênderên me ceh, genim, nok, nîsk, şolik û kizin li ber hev in. Em ji gişan re dibêjin bêndera me. Lê em nabên bêndera me tev de genim e, an jî nîsk e. Lê îsal 70 sal in, ez dinêrim xwediyê bêndera me bi ehmeqî û ji bo ku xwe qapan bike û xelkê bixapîne dibê bêndera min hemû genim e. Li ser genim deynan dike, zad bi zad tîne, wextê bênderê deyndar tên dinêrin ku xwediyê bênderê derew kiriye.

Îro hikûmeta Tirkiyê jî bûye wek wî bêndervaniyê. Evqas sal digot: "Li Tirkiyê ji Tirkan pê ve kes tuneye." Lê ku îro xwediyê deynan bi qirika wî girtine, bêndera wî derket meydanê. Ji bo vê mesela Bosna-Hersekê, hikûmeta me dibê: "Tewlo, ma emê çawa qebûl bikin, îro li Tirkiyê 4 mîlyon hemwelatiyên me yên Boşnaq hene." Gelek baş e; ez kefîl, li Tirkiyê 4 mîlyon Arnawût, 4 mîlyon Çerkez, 4 mîlyon Ereb, 4 mîlyon Laz, 4 mîlyon çîngene û 15-20 mîlyon jî Kurd hene. Ev ên misilman, îca nîv mîlyon jî Ermenî, Rûm û Cihû hene. De îca Başbûx Tirkeş; tebayên te çend kes man?

Lawo! Tirkeşçî û Kemalîstno, xwe bisitirînin, welleh ku çarşefa we jî, ji ser we bê daxistin, hûn ê tazî bimînin. Ev ê ku man jî, yên eslê xwe înkar kirine ne. Dibên ém Tirk in! Ma lazim e ku em wan jî bêjin? De hema emê du-sê heb ji wan bêjin; yek Kamuran İnan, yek Necmettin Cewherî, yek jî Hikmet Çetin, ev yên Kurd. De îca Coşkun Kırca, Kenan Evren, Süleyman Demirel, Turgut Özal jî, kes nizane ji ku derê ne. Em karin vê lîsteyê bikin çend mîlyon, lê de bila evqas be.

Hûn zanin, ez çima van dinivîsim, ez ne nîjadperest im û em Kurd tevde jî ne nîjadperest in. Em ne dijminê tu miletan in. Lê ez dinêrim, ev qirş û mirşên ku dibên em Tirk in, niha tiştek derxistine, berê me digot "Türkiye Ordusu, Türkiye Polisi, Türkiye Bankası." Lê ew niha dibêjin "Türk Ordusu, Türk Polisi, Türk Bankası û..hwd." Ji aliyek ve jî navê Kurd û Kurdistanê datînin "Doğu, Güneydoğu." Wezîfa ordiyê û polîsan ne ew e ku bi merhemet herin ser welatekî xerîb û ne ji xwe. Ji ber vî awayî, heta ku ji destê wan tê Kurd û Kurdistanê dikin bin lingan û diperçiqînin. Banka jî bankayê wan in, ev banka bi milyaran, bi trîlyonan pere li Tirkan belav dikin, heqê wan jî heye, ji ber ku ev banka yên Tirkan in. Lê ji ber ku ez Kurd im, ez herim bankayên wan, 100 qurûş jî bi deyn nadin min, dîsa heqê wan heye, lewra ez Kurd im.

Êdî ez hew dirêj bikim, bes e, yên mayîn jî, bila xwandevanên min yên hêja bifikirin.

# Awireke dîrokî li ser Zazayan

**Maruf Yılmaz**

Kurdistan hatiye parvekirin, gelê Kurd ji hev cûda dijîn. Yekbûna neteweyî û rêzanî di nav beşên Kurdistanê de pêk nehatiye. Lewra divê ronakbîrên Kurdan ji bo çareserkirina gelşên neteweyî û rêzanî bixebitin. Di nav me Kurdan de hin kesên çavnebar û xêrnexwaz hene, dinivîsin, dibêjin **zazakî** û **goranî** zimanên bi serê xwe ne. Herwiha di hin çavkaniyên Kurdan da jî dinivîsin, dibêjin yekbûna zaravayên kurdî ne gengaz e. Ev camêr an bi zanîn, an bi nezanî dibêjin, zazakî û goranî gelekî dûrî **kurdî** ne! Lê nabêjin dûrî **kurmancî** ne. Ji bo ku mirov bikaribe gelşên zaravayên kurdî çareser bike, divê dîroka Kurdistanê beramberî welatên din bike. Koka zazakî digihêje zimanê **medî**, ku koka zaravayên kurdî yê îroyîn e. Di vî warî de dîroknasê mezin **Juste** li ser kevirekî peyveke bi zaravayê zazakî dîtiye û gotiye ev peyva hanê, peyveke Medî ye. Herwiha **Lerch** û hin kesên din jî weke Juste dibêjin. Lê, **Meyer B.** zazakî û goranî di nav komekê din de dibîne, anku dibêje zazakî û goranî dûrî kurmancî ne. Weke tête zanîn hin ronakbîrên Tirkan jî dibêjin kurdî şaxekî tirkî ye. Lê nabêjin tirkî şaxekî kurdî ye! Nivîskarê Tirk **Ewliya Çelebî** dibêje 15 zaravayên kurdî hene. Ev tête vê wateyê ku wî zarava û devokan tevlî hev kirine. **Ziya Gökalp** û hinde kesên din, xwestine her zaravayekî kurdî weke zimanekî bidin nîşandan. **Joyob** jî dibêje zazakî û goranî dikevin nav zimanê bakura rojavayî farisî. Ji sala 522 B.Z. hinde dîroknasên Ewrûpî li ser zazayan nivîsar nivîsîne û gotine bapîrên zazayan Med in. Peyva "**zuza**" berebere rengê xwe guhertiye, bûye zaza. Ev peyva hanê tête wateyê zozan. Herwiha li gora dîtinên hin kesên din jî zaza Med in û li hêla çiyayê **Geyhanê-Geylanê**, bajarekî Medî bû, Ji navê wî **Dimle** (Deylem- Delam) bû hatine û li derûdora xwe belavbûne. Dîroknasên **Yewnanî** dibêjin navê **Dêrsim** yê kevnare "**Daranis**" bûye, ku ev peyva hanê peyveke Medî bûye.

## WELATÊ DEYLEM

Di hin çavkaniyan de tête xuyakirin ku navê Delam-Deylem di şûna welatê zazayan de hatiye bilêvkirin, ku dikeve rajorê hêla çiyayê Geylan- Gelan- Gilyanê, ku padîşahê zazayan **Nasir** bûye. Wî fermandariya xwe li Deylemê li dar xistiye. Bi qasî ku em pê dizanin, gava Nasir diçe dilovaniya xwe kurê wî dibe padîşahê duyemîn. Lê paşê **Merdawîk** leşkerên xwe dişîne ser Deylemê. Li gora dîtinên hin kesan şerekî dijwar di navbera kurê Nasir û kurê Merdawîk de çêdibe. Kurê Merdawîk fermandarê **Medistanê** bû. Deylem jî bajarekî Medîan-Medistanê bû. Herwiha çend kesên din jî dibêjin zaza Kurd in û Deylem jî bajarekî Medistanê (Mar- Maristanê) bûye. Bi dîtina me jî zaza xwediyê dîrokeke kevnar in, ne ku bapîrên wan Med in. Di demên çûyî de hem li welatên din û hem li Medistanê her kesekî hêzdar radibû dewletek li dar dixist. Ev nimûneyên hanê hatine dîtin. Ji ber vê yekê jî ne pêwist e, ku ez bi kûrbînî li ser vê dabaşê rawestim.

## DÎROKA MEDÎAN

Di hin çavkaniyên Swêdî de, di pirtûka ya bi navê "Konttene Vörld" de tête xuyakirin, ku di qedandina 700 sal B.Z. de, faris û gelên din di bin fermandariya Medan de li hev civiyan û împaratoriya Medan dorfireh kirin.

Gelên Îran û Ewrûpiyan, ji sîstema **Somerî** sûd werdigirtin. Li gora **Alvar** û **Arne** jî ev sîstema **kulnivîsê,** ewilî li Mezopotamyayê hatiye pêk anîn û paşê jî berfirehtir kirine û gihandine nivîsa **kîtenivîsê**. Li gora dîtinên **Heredot** û nivîskarên kevin, med berî farisan nivîsîna kulnivîsê nivîsîne û beriya farisan hatine **Mezopotamyayê**. Wan li wir fermandarî kiriye, ku padîşahê wan **Diyas** (Diyako) bû. Weke tête zanîn **Zerdeşt** pirtûkekê bi zimanê medî nivîsî, ku navê wî "**Kataha**" ye. Ev pirtûka hanê li Medistanê nivîsî. Beriya medan **Somerî** li Mezobotamyayê jiyane. Wan li wir dewleta ewilî li dar xistiye. Zimanê wan weke hin zimanê din xwe berfireh kir û paşê jî, di nav dîrokê de winda bû, bêyî ku li pey xwe çend şopan bihêle. Di hin çavkaniyên Swêdî de tête xuyakirin, ku farisan çanda xwe ji medan girtine. Di vî warî de **Heredot** û **F.J. Billeskov** dinivîsin û dibêjin Med Ariyên berî kevnare ne, ku pêşiya hemûyan hatine Mezopotamyayê û li wir fermandarî kirine. Herwiha zanayên dîrokê hevbîr in, ku Medan 700 sal B.Z. li Medistanê dewletan çêkirine û bandûra xwe li ser gelên din kirine.

Padîşahên Medan ev in
1. **Diyas-** Diyako 647 (an jî 649)
2. **Feraurt-** Ferahort 625
3. **Kiyaxser-** Keyxesro 601

a) Diyako padîşahê ewil e
b) Feraurt kurê Diyako ye, ku bavê wî ji aliyê Asûriyan ve hate dîlkirin.
c) Keyxesro kurê Feraurt e, ku împaratoriya herî mezin li dar xistiye.


Di dawiya 550 B.Z. de padîşahê farisan **Koreş** êrîşê Medistanê kir, di şûna dewleta Medan de ya farisan li dar xist û welatê Medan tarûmar kirin.

## HÎKARİYA DÎROKÊ Lİ SER ZİMÊN

Weke tête zanîn, zimanê kurdî ji zimanê îndo-ewrûpî ye. Li gora dîtinên hin zimanzanan, zimanê kurdî ji zimanê farisî kevintir e. Bê şik e temena zimanê kurdî girêdayê dewr û dewranên ku têde derbas bûye. Di van salên dawî de hin kes bêyî ku vê rewşa hanê bidin ber çav, dibêjin her zaravayekî kurdî zimanekê dinê ye. Anku mirov bi çavê van camêran li zaravayên kurdî binihêre 15-24 zaravayên kurdî hene, ku ev dîtina hanê li derveyî zanyarî û şarezayiyê ye. Yek ji sedemên dûrxistina zaravayên kurdî ev e, ku ji hev cûda jiyane û li seranserê Kurdistanê, ji sala 550 B.Z. heta roja îroyîn dewletên cîran êrîşê Kurdistanê kirine û niha jî dikin. Ji aliyê din ve yekîtiya rêzanî û neteweyî di nav beşên Kurdistanê de çênebû ye. Herwiha vekolînekê bi zanistî li ser zaravayên kurdî nebûye. Dibe ku dijmin nehiştibe, ku Kurd çavê xwe vekin. Zimanzan, **Soane** yekbûna zaravayên kurdî pêwist dibîne. Bi dîtina me jî, divê zaravayekî bingeh bête girtin û ji zaravayên din peyv bêne wergirtin, heta gengaz bibe ji hemû zaravayên kurdî peyv bêne standin û di şûna peyvên biyanî de bêne bikaranîn. Di çavkaniyên Swêdî de tête xuyakirin, ku koka zimanê kurdî 5000 sal kevn e. Li gora vekolvanan, bapîrên Kurdan **Kuta** (Guti), 3000 sal B.Z. wênenivîs li ser qermîtan danîne. Herçend Kurdistan berî zayînê û heta roja îroyîn bûye şergeha dijmin jî, dîsa zimanê Medî li gora morfolojiyê, bingeha zaravayên kurdî yên îroyîn e, Pêzanên dîrokê dibêjin zimanê Medî, 700 sal B.Z. awayekî morfolojî girtibû.

## DU HOZANÊN NAVDAR

Hozanên Kurd yê herî kevn, **Sîn-Lekke** ye û ev helbestvanê hanê bi çendî em pê dizanin, di dinyayê de tête nasîn. Di derûdora 1250 BZ. jiyaye. Navê destana wî **Gilgameş** bûye. Helbestvanê bi nav û deng yê duyemîn jî **Baba Tahirê Ekbatanî** bûye, ku ew di navbera (935-1010-Z.) jiyaye. Ew Kurdê **Lûristanê** bû



*Yekbûna neteweyî û rêzanî di nav beşên Kurdistanê de pêk nehatiye. Lewra divê ronakbîrên Kurdan ji bo çareserkirina gelşên neteweyî û rêzanî bixebitin.*

## PEYVA KURD Û KURDİSTAN

**Tirkzan M. Kaşgarî** di sala 1074 an de nexşeyekî çêkiriye. Li gora dîtina wî **Kerman** (Kirmanşan-Hemedan) ji perçeyên Medistanê veqetandine û navê wî danîne Kurdistan. Lê di çavkaniyên Swêdî de tête xuyakirinê, ku peyva "**Gordîan**" gelekî berî zayînê, di şûna welatê Kurdan de hatiye bikaranîn. Ev peyva hanê gelek caran bi awayekî çewt nivîsîne. Ji ber ku, di hin zimanên îndo-ewrûpî de tîpa "c", him "g" û him jî "k" ye. Bi qasî ku em pê dizanin peyva Kurd ji "Gordîan-Gurdîan tê. Anku navê bajarekî Medîan) "Gordîan bûye û paşê di şûna welatê Kurdan de hatiye bikaranîn.

Li gora lêkolînên ku hatine kirin, peyva Med anku navê wî, di der û dora 800 an de hatiye xuyakirin û di sala 647 an de dewletekî Medî li dar xistine. Berî zayînê bi 700 salan, li Mezopotamyayê fermandarî ji aliyê Medan ve dihate birêve birin. Vê dema hanê heta 550 B.Z. ajot. Li derdora 550 B.Z. **Kirus**, ku diya wî Kurd bû û bavê wî kes nizane ji kîjan dê bûye. Wî Faris û gelên din li hev civand û di bin ala farisan de împaratoriyeke mezin li dar xist. Di sala 500 an de farisan împaratoriya xwe berfirehtir kirin û hetanî Behra reş çûn. Paytextê Medîan **Ekbatana** (niha Hemedan e) bû, ku ji 7 dîwaranbedenan û bi mora tavê-rojê ve hatibû çêkirin. Piştî têkçûna Medan Ekbatana bû havîngeha şahên Farisan.

**Çavkanî:**
-Hela Varlden Î Fakta
-Nordsteds Uppslagsbok
-Alla Tiders. Historia
-Grekernas Varld Bennier Varldens Historia
-Litteraturens, Varldens Historia Forntiden
-Kürdistan Tarihinde Dersim. Rûpel: 1-80

# Kirmanc adet û torune xo kene

**Embazê Delal,**
Simare ju xevere nusnen, na xevere seveta miletê ma Kirmanc zaf muhima, hora welat' te ni, Welatune ejnebi de ki, Kirmanc adetu torune xo kene, na adet u tore milete Kirmanc suka Berline ki bene, tika de simare taye kerdena Milete Kirmanc u Alman, Kulture, Folklore ma sero tera u peda kene, nine ra basken.

Berlin Spandauer en cawo ke virende milet amo tede goç noru, tede ware virasto, temele Berlin esto, Spandauer'o. Name Berlin mane xo "Welate heş (hesobir)" ra gureto, niza wahtu zomande gem i gur viye tede zas heş biye milet ke amo biyo, zaf, hetera ki bir dar u ber qirkerdo, heş ki biye senik, xora nika name heş Berlin ra mendo.


Na suka Spandauer de 27.6.92 de Şayiya dostena Alman u Kirmancu biye, na Şayi'ye Mudire nahiya spandauer u komelune Kirmancu peda kerd, Şayiye ju kela gane de biye, dorme kêla eve qanalu çarno, ju korpi virasto na korpi sera sone kêla, eke verva kêla şime ison virende hire allê (bayrax) Kurdistan sere bereqine, ison ke na all di zere ison beno hira, rehe keno beno can şire, ceverde ke sime zere dorme duzlug pero eve çardaxu çarno kos ju de ki çadira Kirmanc nan tede soja ma kerda germin tede nane tire pozene, sona nane tire cena heto ju de ki serçele pozene, serçele kena horte nan isun xo Kurdistan de saye keno, saat'e corine de Şayiye peda biye, virende nahiya Spandauer ra ju mordem gesey kerd, dostena brayena Alman u Kirmancura baskerd, ura tepiya Folklore kirmanc vejay hete Muş u Bitlis ra kay peşkeş kerd, Folklor'e Xelko bra yunan vejay zaf kawo de rind kerd horte, zaf sa bime, dina de doste ma ki este, mekteve Spandauer ra cenc Folklor kaykerd, Hozan Şah tuma u Şiar ya vejay Kirmanci u Tirki lawuk vake, Zubeyir Aydar u Xanima xoya vejay qeseykerd mare selame xelke ma ardo, hal mezale xelke ma ra bas kerd, nêheqe dewleti Tirk ra bas kerd, Domane kirmanc vejay kaykerd. A roze, roza Kirmancu viye, soja ma ma, kaye ma, milete ma, domane ma, Cuanike ma, tu vana A roze hewa ya ke gurete hewa Kurdistan viye.

Name na cay Zitadelle yo, tika de hire asm na şayiya alman u Kirmancu devam kena, peye her hefteyde zewna mijar bene, rojine vere made tika ju veyve kirmanciye beno, je veyvuna welat eve veyvike welat aspar kene dawul u zurna, na veyve eve adet u tore milete Kirmanc beno.

Mudire na kêla qeseye vake "Na all (bayrag) na gilra vinde hata ke Dewleta kirmanc peda pi u waht nane ru bene welate xo" na Qese zer da ma qeweta ma des qat ard peser.

Wes u war bimane hata reyna

***Wusxan***





ŞEHÎDÊN GULANÊ NAMIRIN



- Sergotar: Mehn Şehîdan
- Hevpeyvînek Bi Dr. Ordîxan û Prof. Celîlê Celîl re
- Çalakiyên REWŞENê li EWROPA yê
- Xelek : V. Sologob
- Kürt Kızı Zenge : Dr. Cemşid Bender
- Di Zaraveyên Kurdî de Zêst û Pirsika Nasandinê : Amed

## HEJMARA REWŞENÊ YA NÛ (4) DERKET

Berhema Navenda Çanda Mezopotamya, Rewşen, weke ku tê zanîn mehê carekî derdikeve û di rûpelên xwe de cih dide nivîsarên Kurdî û Tirkî, lê giraniya xwe dide ser nivîsên Kurdî.

Di vê hejmara xwe ya nû de sergotara Rewşenê di derheqê şehîdên Kurdistanê de ye.

Di sergotarê de girîngiya biranîna şehîdan di dawiya nivîsê de wiha hatiye îfade kirin: "Ev şehîdên me ne tenê lehengên me yên, dîrokî, siyasî û leşkerî ne, herwiha lehengên roman, helbest, stiran anku lehengên edebiyata me ya hemdemî ne. Şehîdên me hîm û bingehên pêşveçûna ziman, edebiyat û çanda me ne. Xwîna şehîdan e ku dora azadiyê av dide."

Di vê hejmarê de hevpeyvînek bi Dr. Ordîxan Celîl û birayê wî Prof. Celîlê Celîl re hatiye pêşkêş kirin. Di hevpeyvînê de herdu birayên hêja li ser rewşa Kurd û Kurdistan û wêje, dîrok, çand û Enstîtuya Kurdî nêrînên xwe anîne zimên.

Zana Farqînî di beşa "Niştima xwe binase" de Amedê bi çar rûpelan daye naskirin.

Helbestvan Abdurrahman Durre jî derheqê şairekî Kurd ê kevin Baba Tahirê Hemedanî nivîsiye û çend helbestên wî pêşkêş kiriye.

Wekî din, Feqe Huseyn Sağnıç, İ. Omerî, Mistefa Reşîd, Cemîla Celîl, Felat Dilgeş û İ. Xort di babetên cuda cuda de bi zirafê kurmancî nivîsandine.

Di vê hejmarê de Wusxan bi dimilî nivîsarek bi navê "saq saq Paşa" pêşkêşê xwendevanan kiriye.

Süleyman Danışman, Mehmet Takır û A. Haydar Demir jî bi tirkî li ser çend babetên girîng nivîsandine.

Ku Rewşen di wextê xwe de jî derçûbûya, bi baweriya me tu kêmasiyên wê yên girîng nediman.

# PÊNÛS



Amed Tîgrîs

## Seferberiya xwendin û nivîsandina kurdî

Ziman bi nivîsandin û xwendinê pêşve diçe. Heta niha me digot "tiştek tune ye ku em bixwînin û zimanê xwe hîn bibin."

Lê, îro me bi têkoşîneke dijwar û bi xwîna hezaran şehîdan, sînor û zincîrên qedexebûna nivîsandin û xwendina kurdî çirand û qetand. Qanûnên nîjadperest û dagîrkeran êdî naxebitin. **Rojnameya Welat û Kovara Rewşen** wek kelemên nav çavên nîjadperest û dagîrkerên salî di wexta xwe de derdikevin. Welat heta niha 20 hejmar derket. Ew, hejmar bi hejmar baş û xurt dibe. Ji aliyê naverok, form û ziman ve gav bi gav pêş ve diçe û cîhê xwe digire. Bi vê pêşketin, firehbûn û cîh girtinê re abone û xwendevan jî her hejmar zêde dibin. Lê, dîsa jî ev têr nake. Bi tenê di bin bandora Tirkiyê de qasî 20 milyon Kurd hene. Ji 20 milyonî re rojnameke 15-20 hezarî ne tişt e. Problema me ya herî mezin û dijwar xwendina kurdî ye. Gelê Kurd cara pêşî bi kurdî rojname û kovar dibîne. Ji zimanê xwe yê nivîskî re biyanî (yabancı) ye. Bi kurdî qise dike, lê, nikare bixwîne.

Gelo ji vê yekê re çare çi ye?

Çareya herî mezin û berfireh destpêkirin û hewildana seferberî ya hînbûna xwendin û nivîsandina kurdî ye. Her Kurdekî ku dikare bi kurdî bixwîne, ew di hefteyekê de yekî din hînî xwendinê bike. Yê ku hînî xwendinê dibe, vê carê ew jî yekî din hîn bike. Herwiha di navbera çend hefteyan de hejmara xwendevanên Kurd digêhe bi sed hezaran. Di nav salekê de milyonan dibîne. Di perwerde û hîndekariyê de, ji vê metodê re dibêjin **"metoda hînkirinê ya seferberiyê"**

Ev metoda hînkirinê ya seferberiyê, ji bo ew gelên bindest ku wek me bi salan zimanê wan ê nivîskî qedexe an jî nehatiye nivîsandin bi kar tînin. An jî yên ku alfabeyên xwe diguhêrin bi kar tînin. Di sala 1928 an de dema Mustafa Kemal alfabeya erebî bi ya latînî re guhert, bi kar anî. Wê demê li Tirkiyê kursên hînbûna alfabeya latînî jî tune bûn ku xelk dom bike û hîn bibe. Dibe ku li bajarên mezin kursên wiha çêbûn an na. Xelk di çend hefteyan de, bi riya rojnameyan alfabeya latînî hîn bû. Hevdu hîn kirin.

Îro Kurd ne wek Kurdên 20-30 sal berê ne. Yên welat pirraniya wan dikarin bi tirkî bixwînin û binivîsin. Yên derveyê welat jî dikarin bi zimanekî din bixwînin û binivîsin. Yanî civata Kurd li gor xwe û gelên cîran civateke xwende û zana ye. Bi tenê yên ku bi kurdî qisekin, dizanin û bi zimanekî din xwendine wek berê jî min nivîsandi bû, ew dikarin di navbera pênc deqîqeyî de hînî xwendin û nivîsandina kurdî bibin.

Ji xwe em ji her alî ve ketine seferberiyê. Qet nebe em van lalên xwe bi lez û bez bi ziman bikin. Ser û zikên lalan tije ne, lê ziman tune. Eger ziman vebe êdî tû hêz û kes nikare bigire...

# Rastnivîsandina zimên

● **Kesê ku bi qedrê zimanê xwe nizanibe, bi qedrê welatê xwe jî nizane, bi qedrê tu tiştî nizane. Berî hemû tiştî ziman, ziman, dîsa ziman...**

**Huseyîn Denîz**

Di van salên dawî de gelek kitêbên bi kurdî derdikevin. Çend kovarên mehane jî, çend rûpelan bi kurdî derdixin. Ji xwe ev rojnameya ku di destê we de ye, **Rojnameya Welat** tev de bi zimanê kurdî ye. Dîsa di van salên dawî de gelek kasetên bi kurdî derdikevin. Ez dixwazim li ser rast ne nivîsandina zimanê kurdî bisekinim û bala we bikşînim ser vê tevlîheviyê.

Rast e, îro di destê me de kitêbên rastnivîsandina zimanê kurdî tune ne. Ferhengek bê kêmasî jî, rêzimanek baş jî tune ye. Ne hewce ye ku em dîsa bêjin; tê zanin ku zimanê kurdî heta van salan qedexe bû. Ev kêmasî jî, ji ber qedexetiya zimên in.

Di nivîsandina zimanê kurdî de îro tevlîheviyek pirr mezin heye. Çawa tê ber devê me û serê pênivîsa (qelema) me em wisa dibêjin û dinivîsînin. Bi guman, min, ji ber vê tevlîheviyê û ne rast nivîsandinê jî, em hin bi hin ji zimanê xelkê xwe bi dûr dikevin. Gelek kesên ku nû hînî xwendin û nivîsandina kurdî dibin, dibêjin, em ji tiştê ku dixwînin tiştekî fêm nakin. Gelo emê çawa hînî zimanê kurdî bibin?

Bi gumana min zimanê me ji me re ne gelekî tevlîhev e, giran e. Lê, em vî zimanê paqij, ji ber nezaniya xwe, ji xelkê xwe re giran dikin û xelkê xwe ji zimanê kurdî sar dikin. Em bi nezaniya xwe wan gêj dikin, şaş dikin.

Meha Nîsanê ez ji bo vekirina Enstîtuya Kurdî çûbûm Îstenbolê. Em bi teqsiyê ji mala Musa Anter derketin çûn cihê Enstîtuyê. Xwediyê teqsiyê Kurmanc bû, di rê de ji me re kasetek kurdî xist teybê. Dengbêjê kasetê di derekê de peyva gul, wek tirkî gûl got. Xalê Musa ji nişka ve bêhna xwe teng kir û go: "Nalet li wî zimanê te yê bi gû be." Zîvirî ser me û go: "Hûn dibînin bê çawa zimanê me xera dike, ji 'gul'a me re dibê 'gûl.' Kesê ku navê gul'ê ne bihîsti be, gelo heqê wî heye ku stranan li ser 'gul'ê bêje?

Bi pirranî li ser kasetan gelek şaşî û xeletiyên nivîsandina kurdî hene. Navê stiranên tev xelet tên nivîsandin. Bêrîvanê-berivan, welat-velat dinivîsînin. Xezal dikin hazal, xerîbê-geribe, negrî-neğrî, lê gulê-le gule dinivîsînin. Kes guh nade ferqa e, ê, x, u, û, i, î, q, k û tîpên din. Di kovar û kitêbên bi kurdî de jî xeletiyên gelek mezin hene. Bi van xeletiyan jî zimanê kurdî diherimînin, dilewitînin. Ku wilo here û kes li ser xeletiyan nesekine, kes serê xwe bi zimanê xwe neêşîne, wê demek bê emê nema bi zimanê xwe zanibin. Wê zimanê nivîsandinê û zimanê xeberdanê ji hev dûrkevin. Wê xelkê me bi kurdiyekê bipeyive, rewşenbîr û nivîskar bi kurdiyeke din bipeyivin. Heqê tu kesî tune ye ku zimanê me xera bike.

Gotinek Tirkan heye, dibêjin, "Dînek kevirekî davêje bîrekê, çil kesên biaqil nikarin derxin. Xeletî yê kesên ku bi zimanê kurdî nizanin dikin, hin bi hin belav dibin. Wê di demek nêzîk de ziman di nava xeletiyan de bimîne. Kes nema kare peyvên xelet bineqîne û ji hev derxîne. Kurmanc dibêjin, "Berê bibe dîk paşê bang bide." Hinek mirov ji me Kurdan hêj nizanin zimanê xwe, ne zanin bi kurdî bixwînin, ne zanin bipeyivin; xwe li nivîsandinê girêdidin. Ez bawer im ku ew kes jî nizanin bê çi dinivîsînin û dibêjin çi. Şîreta min li me hemûya ev e ku berî her tiştî divê em hînî zimanê xwe bibin. Kengî be em karin dest bi nivîsandinê bikin. Niha ne hewara nivîsandinê ye.

Di gelek nivîsandinan de ez rastê peyva ji lewre têm. Ez nizanim bê, kê ev peyva xelet derxistiye. Hema kê berê ev nivîsî be mala wî pê ava be. Lewra, lewra ji lewre nayê nivîsandin. Lewra rast e, ji lewra nerast e. Lê em dinerin di gelek nivîsandinan de bi nezanî peyva ji lewre tê nivîsandin. Lewra bi tirkî çünkü ye. Gava ku em bêjin ji lewre dibe çünküden. Ev jî nerast e. Li ser lewra ezê ji Mem û Zîn'a Ehmedê Xanî çend rêzan li vir binivîsînim. Belkî ên ku serhişkiya peyva ji lewre dikin, terka vê nezaniya xwe bikin.

**Ew hor û perî di bê bedel bûn**
**Lewra ku ji nûrê Lemyezel bûn**

**Lewra ku bi şêrî şibhê şêr bû**
**Roja şerê ew hezar-î mêr bû**

Ne tenê lewra xelet û ne rast tê nivîsandin; gelek gotin ne di cihê xwe de û pirranî jî xelet tên nivîsandin. Kesê ku tiştekî dinivîsîne, divê zanibe bê dibêje çi. Peyva ku nizanibe bê çi ye, ya bila bipirse fêm bike bê di çi maneyê de ye, yan jî bila wê peyvê ne nivîsîne; bila peyvê ku zanibe bixebitîne. Nezanî ne şerm e, hînnebûn şerm e.

Ezê carna li ser çewtî û nerast nivîsandina gotinan bisekinim. Ez dixwazim zanayên me, zanayên zimanê kurdî li ser van xeletî û xerakirina zimên bisekinin. Divê em zimanê xwe bê xwedî nehêlin.

Bi taybetî ez ji kasetvanan re dibêjim: Stiranan rast binivîsînin. Ku hûn nizanibin, ji zanayan bipirsin. Ji bo kara we, tu heqê we tune ku hûn zimanê me xera bikin.

Kesê ku bi qedrê zimanê xwe nizanibe, bi qedrê welatê xwe jî nizane, bi qedrê tu tiştî nizane. Berî hemû tiştî ziman, ziman, dîsa ziman...

# Ken û Girîn




Ken û Girîn navê pirtûka **Amed Tîgrîs û Roman Motkî** ye. Ev pirtûk berhevoka pêkenînên (fikrayên) kurdî ye. Di sala 1989 an de li **Stockholmê** ji aliyê weşanxana **APEC** ve hatiye çap kirin. Pirtûk, ji 268 pêkenînan pêk tê û 286 rûpel e. Wek di hejmara pêkenîn de jî diyar dibe, pêkenîn gelek kurt in. Her pêkenînek rûpeleke pirtûkê jî nagire. Hema hema ji her herêm û perçeyên Kurdistanê pêkenîn hene. Bîhna tevayiya Kurdistanê ji pirtûkê tê.

Nivîskarên Ken û Girînê, li ser pêkenînên kurdî di pêşgotina xwe de, wiha dinivîsînin:

"Di nav gelê Kurd de, edebiyata devkî, li gor edebiyata nivîskî gelekî li pêş û dewlemend e. Ev edebiyata devkî: Şîretname, gotinên pêşiyan, pêkenîn, mamik (tiştanok), stran, çîrok û hwd..."

"Pêkenîn, neynika (eynika) civat û gelan e. Ew, problem û daxwazên gel bi awayekî bi ken û yarî (henek) tînin zimên û qerekterekî neteweyî didin wan. Her civat, komik û gel li gor dema xwe pêkenînan diafrîne. Mirov dikare bêje pêkenîn rexneyên (eleştiri-kritik) gel in. Lê, rexneyên ne edetî ne; yên lê zêde û mezinkirî ne."

"Di pêkenînan de, rewşa her neteweyî ya dîrokî, aborî, polîtîk, civakî, olî (dînî) û kulturî derdikeve holê. Ji ber ku mijarên (babetên-konuyèn) pêkenînan ew in. Pê re daxwaz û pêşniyariyên gel diyar dibin. Her netewe li gor qerekter û kultura xwe taybetiyeke wê heye. Ji ber vê yekê jî, pêkenînên me jî dibe, ku ji gelên din re bê mane û bêkenîn bên. Em wan gelên din li aliyekê bihêlin, di nav van pêkenînên me yên berhevkirî de, mirov, bi awayekî gelekî vekirî du civatên ji hevdu cuda dibîne. Civata Kurdan a feodalî û ya modern a îroyîn. Problem û daxwazên civatê di pêkenînan de zelal û diyar dibin. Di nav herdu civatan de guhertinên aborî, civakî, olî û kulturî xweş û baş tên dîtin..."

Bi rastî jî di warê hunermendî û edebiya devkî de, gelê Kurd gelek kesên herîqa derxistiye. Hema hema di her gundî an jî taxî de kesên wiha yên bi nav û deng an jî herîqa hebûne û hene. Çi **Şarlî Şaplî** û **Meleyê Meşûrê** me yên bê nav û deng hatine û çûne. Lê hezar mixabin ji ber ku em nebûne dewlet, deng û navên kesên wiha ji gund an jî taxa wan bêtir belav nebûne. Li seranserê Kurdistanê nehatine nas kirin.

Mirov dema Ken û Girîn dixwîne, bi rastî jî, dikene û digirî. Mirov huner û qebîliyeta gelê Kurd a hêja dibîne. Belengazî û stembariyê di giyan û ruhê xwe de hîs dike. Ji aliyê din ve girîngiya berhevkirina berhemên folklorîk dibîne.

Divê berî her tiştî em berhemên xwe yên hezar salan ku di bin qedexe û stembariyê de nehatine berhevkirin û nivîsandin, berhev bikin. Wan ji çarçove û sînorê herêmî derxînin. Ji mirin û windabûne biparêzin. Serçavî û hîmê ziman, edebiyat û kulturê, berhemên folklorîk in.

Ken û Girîn bi kurdiyeke sivik û zimanê gel hatiye nivîsandin. Orjînala devokên herêmî nehatiye guhertin. Ev devok li gor rêziman û rênivîsa kurdî hatine nivîsandin. Ji çend aliyan ve hêja ye, ku mirov Ken û Girînê bixwîne. Nivîs û hevok kurt in. Bi zimanê xelkê hatiye nivîsandin. Ji ber ku mijar balkêş û bi kenîn in, xwendin hêsan e. Bi taybetî ew kesên ku nû dest bi xwendin û nivîsandina kurdî kirine re gelek baş e. Divê mirov Ken û Girînê bixwîne. Ne ji bo ken û ne jî, ji bo girînê. Ji bo xwe naskirinê. Ji bo ku hinek gavên din yên pêşketî bavêje. Li derê welat pirtûkên kurdî di navbera 200-300 de tên firotin, lê çapa Ken û Girînê ya yekemîn qediya. Çapa duyemîn bi hinek guhertinan ve, li ser derketinê ye.

# Pîremêrd î nemir

## (1867-1950)

Mehabad Kurdî

(Soranî)
Navê rasteqîne ya Pîremêrd (Tofîq) kurî Mehmûd Axa, kurî Hemza Axayê Mesref û li sala 1867 li bajêra Silêmanî li taxa (Giwêje) li diya xwe bûye.
Pîremêrd li temena 6-7 salî destî kiriye bi xwendin li hucreya Mela Hisên Goce li Silêmanî.
Piştî tewaw kirina xwendin Pîremêrd dibe Feqhe li mizgewta Hemza Axa ku bapîra wî bûye. Em dizanin berî niha Feqê li Kurdistan her gav digeriyan bi şûn zanist û zanyarî de, bê guman Pîremêrd jî yek li wan feqêyan e ku gelek dever û gundî welêt geriyaye. Li sala 1882 Pîremêrd bûye katib li dayera nifûs li Silêmanî. Li sala 1898 li gel Şêx Seîdî Hefîd (bavê Şêx Mehmûd) sefer kiriye bo Tirkiyê, li piştî du sal çûyte hec (Mekke). Hacî Tofîq di nivîsandina Farsî de pirr jêhatî bû e. Pîremêrd li Îstenbol li çend Kurdên welatparêz rojnama (Kurd) belav kiriye û gelek helbest û pexşan bi navê wek (Silêmanlî Tofîq) û (S.T) têda nivîsandiye.
Li sala 1909 bi qaîmqama (Colamêrg) teîn kiraye û li sala 1918 bi muteserrîfa (Emasiye.) Helbete pîremêrd her kat li xeyala Kurdistan de bûye, li axir de pîrekî xwe û du kurr jî li Tirkiye dihêle û vedigere Kurdistanê. Di sala 1926 beşdar dibe li derkirina rojname (Jiyan). Di sala 1937 jî rojnama (Jîn) derdixîne. Pîremêrd li sala 1950 koçî duwayî kir û gilko (tirba) wî li ser gira (Mame yare) ye cêh jî tune.



Pîremêrd

Em li vê derê helbesta Newroz ya şaîrî nemir Pîremêrd dikeyne diyarî xwendevanên hêja ya Welat

**Em rojî salî tazeye Newroze hatewe**
**Cejnêkî konî Kurd e be xoşî û be hatewe**
**Çend sal gulî hîway ême pê pest bû taku par**
**Her xwênî lawekan bû gulî alî newbehar**
**Ew renge sûre bû ke le asoy bilindî Kurd**
**Mijdey beyanî bo gelî dûr û nizîk ebird**
**Newroz bû agirêkî wehay xiste cergewe**
**Lawan be îşiq eçûn be berew pîrî mergewe**
**Ewa rojhelat le bendenî berzî wilatewe**
**Xwênî şehîde rengî şefeq şewiq edatewe**
**Ta êsta rûy nedawe li tarîxî mîlleta**
**Qelxanî gulle singî kiçan bê le helmeta**
**Pêy nawê bo şehîdî weten şîwen û girîn**
**Namirin ewane wa le dilî milleta ejîn**

**Têbînî**
**Ji bo vî nivîsandin sûd lev çavkanî wergirtiye:**
**1/ Pîremêrdî nemir, nûsînî Mihemed Resûl (Hawar).**
**2/ Sirwe, jimare 47.**

# AZADÎ



**Abdurahman Durre**

## Îsmet Sezgîn û Mele Qasim

Mele Qasim mirovekî dînikî û saf bû, birayê Mele Mistefayê Keveriyê bû. Seydayê Mele Mistefa jî, yek ji melayên mezin ê Kurdistanê bû, li navça (nehiya) Diknûka Melazgirê meletî û seydatiya medresê kiriye (Xwedê rehmeta xwe li dê û bav û miriyên hemû Kurdan ke û li we ke jî). Min wî seydayê muhterem dîtibû û çend ders jî li ba wî xwendibû. Rind tê bîra min.

Rojekî Seydayê Mele Mistefa tê medresa xwe, mêze dike ku serê talebe (suxte)kî wî yê xwendina bilind şikestiye, dibêje: "Ev çi bûye, çima serê te şikestiye." Feqiyê wî, dibêje: "Seyda, Mele Qasim serê min şikênand." Mele Mistefayê rehmetî hêrs dibe, dibêje: "Kuro, Mele Qasim, te çima serê mêrik şikênand." Mele Qasim dibêje: "Mele Misto, min serê wî neşikênand, me qirên kir, wî serê xwe li dîwar xist, serê wî şikest." Mele Mistefa dikene, Mele Qasim dibêje: "Mele Misto, te dî; min îfadekî çawa da, eger ez ebûqat bûma, minê mehkemê bihejandana." Mele Mistefayê rehmetî, ji feqiyê serşikestî re dibêje: "Kurê min, tu dibînî, ku Mele Qasim efsenekî (saf) dînik e, li qisûra wî nenêre."

Çîroka Mele Qasim wiha, lê Îsmet Sezgîn, wezîrê karê hundir, qey ew jî dîn û har bûye ku dibêje: "Îşkence tuneye, yên ku polîs wan dike binçav ku li erdê bikevin dimirin, yên ku bixeriqin jî li nexweşxanê dimrin. Li Şirnexê jî, pîlot bi xeletî bombe avêtine gund, çend hemwelatiyên me mirine, çend jî birîndar bûne."


Mirov li ser van gotinên Sezgîn Axa difikire û dibîne ku, ji îfada Mele Qasimê dînik, bi sed qatî firofaştir, çirto-virtotir û bê mentiqtir e. Li ba me gotinek wiha heye, dibêjin: "Virek..................."

Ji xêra Xwezî re niwênerekî (mebûs) bav çê û xal çê, di meclîsê de hebûna, ku gava Sezgîn van virrên bê mentiq û bê xwê dikir, di dev û pozê wî de lêxista ku brûsk ji ber çavê wî yê zexel bavêta û di nav xwîn û gemarê de bipilpitiya û jê re weke Mele Qasim bigota: "Min destê xwe hejand, bê hemdê min li dev û pozê te ket.."

Xwendevanên hêja, "gur" tu caran kedî nabin, çara wî di poz de lêxistin e. Li qisûra min nenêrin, ez wiha dizanim.

Ku me behsa seydayê **Mele Mistefa, Mele Qasim û Diknûkê** kiriye, em dixwazin vê serpêhatiya wan jî bêjin. Rojekî Deral Begê, kurê Mihemed Emînê Sofî Paşa, gazî seydayê Mele Mistefa dike, dibêje: "Seyda, kerem ke em li mala me xwarinê bixwin." Seyda dibêje: "We çi çêkiriye?" Deral Beg jî dibêje: "Seyda me meletirî çêkiriye (meletirî navê xwarinekî kurdî ye, ku jê re keledoş jî dibêjin)." Seyda dibêje: "Deral Beg! Bi mishafa min xwendî, heta mala we "axatirî" çê neke, ez nayêm." Deral Beg lava dike, dibêje: "Seyda, min ne ji bo tiştekî got, navê wî ev e." Mele Mistefayê rehmetî dibêje: "Deral Beg, tu heta ku navê wî daneynî axatirî ez nayêm." Deral Beg, dibêje: "Seyda, de bila navê wî axatirî be." Û bi hevdu dikenin û kêfxweş dibin.

Ez jî dibêjim, heta ku Îsmet virro, Silo tirro û Guro dirro bi vê hiş û sewdayê bin, emê hê pirr tirr û virrên seqet ji wan seh bikin û ne demokrasî çê dibe, ne jî memokrasî!...





Kovara Çanda Gel

# Kovareke nû "Çanda Gel" derçû

Nasir Coşkun

Pirranî rewşenbîrên Kurdistanê yên welatparêz, îro di nava **Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan- YRWK** de xebata xwe ya rewşenbîrî ji gelek aliyan ve didomînin. Li her çar aliyên Kurdistanê hêza xwe dikin yek û di riya serxwebûn û azadiyê de dimeşin.

Torevan dengê YRWK (Şaxê Başûrê Kurdistanê) bû. YRWK li Başûrê Kurdistanê di sala 1990 an de hate damezirandin, bi damezirandina xwe re kovara Torevan, ku kovareke çandî û wêjeyî bû bi kurdî derdiket (3 hejmar hatin weşandin), derhanî.

Ji ber gelek sedeman Torevan hate rawestandin. Lê bi her sê hejmarên xwe roleke pêwist di nava rewşenbîran de lîst.

Piştî rawestandinê, YRWK-Şaxê Başûrê Kurdistanê Kovara "Çanda Gel" derxist. Heya niha sê (3) hejmar ji kovarê derçûne.

Di vê hejmara 3'yan de ev gotar cihê xwe digirin: Gotarek li ser **Melle Abdurahman, Niştimanê xwe binase** (Botan), **Teror, Hevpeyvînek bi Hatib Dicle re, Dîn û Welat, li ser endezyariya Kurdistanî, Çîrok... Nûçeyên çandî.** Ji bilî van jî gelek gotarên kurt hene.

Nivîskarên ku di hejmara 3'yan de cih girtine ev in: **Melle Îbrahim Orfelî, Avukat Zorba, A. Azad, C. Deştî, Dr. Cemşîd Bender, Simko, Ristem Bin Zal...**

Di sergotara xwe de sernivîsariya Çanda gel, li ser avakirina Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanî disekine, her wiha diyar dike ku ji bilî serxwebûn û azadiyê tu rêç û şop nikarin gelê Kurd ji bin destên dagîrkeriyê rizgar bikin.

Ji bo zanînê, kovar 57 rûpel in, 8 rûpel kurdî ne, yên din jî erebî ne. Kovarê giraniyek daye ser beşê erebî, sedema vê yekê jî diyar e.

Bergeya Kovarê ya yekemîn wêneya şehîd Melle Abdurahman e, bi reng hatiye çêkirin. Bergeya duyemîn jî, daholvan û zirnevanekî Kurd in, wêneya wan jî bi reng hatiye çêkirin.

Çanda gel li hemû rewşenbîrên Kurd pîroz be, serkevtina wê daxwaza me ye.

Hemû xwendevan dikarin Çanda Gel ji navenda YRWK li Bonnê bixwazin, her wiha înformasyon û agahiyên firehtir, ji YRWK bistînin. Navnîşana xwestinê li jêr e:

YRWK- Çanda Gel
Maxstr. 50-52, 5300 Bonn 1, Germany

# Programek ji Radyoya Dengê Serxwebûnê

**Sîdar:** Programa Bexçeya Zarokan"
Berhevkirina Beşîr Botanî
Pêşkêşkirina koma şehîd Bêrîvanê

**B. Botanî:** Êvar baş gelî gênc û zarokan! Ev dema we û hemû demên we xweş û şad bin! Gênc û zaroyên hêja di vê programê de, dê Sîdar du mêhvanên hêja ji we re pêşkêş bike. Fermo Sîdar!

**Sîdar:** Zaroyên hêja! Îro du heval ji welêt bûne mêhvanên me, em bi navê koma şehîd Bêrîvanê gelekî bi xêrhatina we dikin!

**Koma Şîrwan:** Xêrandar bî, spas!

**Sîdar:** Heval ji kerema xwe re, xwe pêşkêşî guhdaran bike!

**Jîn:** Navê min Jîn e, li Kurdistanê, di sala 1977 an de li Wanê hatime dinê

**Sîdar:** Hûn hêj gênc in û biçûk in, we çi planek kiriye ji bo pêşerojê

**Jîn:** Em jî weke zarowên vê dinyayê dixwazin bi zimanê xwe biaxivin û fêrî muzîkê bibin û karê xwe pêşve bibin...

**Sîdar:** Hunermendên ku hûn guhdariya wan dikin kî ne?

**Jîn:** Nemir **Mihemed Arifê Cizîrî, Aramê Dîkran,** dengbêjên **Hunerkomê** û hwd.

**Lorî lorî lorî lora min î**
**Tu ronîka lê lê çavê min î**
**Lorî dibêm lorî na yê**
**Kes gaziya me da na yê**
**Em hêsîr in li dinyayê**
**Lorî lorî lorî lora min î...**

**Lorîkê çavê gela me**
**Ji berê da bê dil mame**
**Ji welatê xwe dûr mame**
**Lorî lorî lorî lora min î...**


**Lorîkê çavan direjim**
**Tenbûrvan im, xweş dengbêj im**
**Ji bona welat dibêjim**
**Lorî lorî lorî lora min î...**

**Sîdar û B. Botanî:** Gelek spas

**Jîn:** Spas xweş!

**Têbînî:** Fatma xwişka Jîn ew jî bi me re bû, lê ji şerman ne axift, mixabin e...

**Ev der Dengê Serxwebûnê ye Stockholm**
Programa "Cîhana Çandî"
Berhevkirin û pêşkêşkirina Beşîr Botanî
Çavpêketinek (hevpeyvînek) digel koma Şîrwanê, roja înê li



rêkefta 22.5.1992

**Beşîr Botanî:** Guhdarên hêja! îro koma Şîrwanê ji welêt bûye mêhvanê Radyoya Dengê Serxwebûnê.

Hevalên hêja! Em bi navê Radyoya Dengê Serxwebûnê gelekî bi xêrhatina we dikin.

**Kazim:** Di xêrê de bin û pirr spasiya we dikim

**Beşîr Botanî:** Heval em îro dixwazin çarpênc pirsan ji we bikin. Ya yekê jî, kengê koma Şîrwanê ava bûye?

**Kazim:** Ji bo van pirsên ku Radyoya Dengê Serxwebûnê ji min dike, ez dilxweş bûm, hêvîdar im ku guhdarên me jî dilxweş bin û silavan li wan dikim. Koma Şîrwan li Kurdistanê, li bajarê Wanê, di gundekî de hate dinyayê. Lê ji mêj ve, di civîn û civatan de distire. Paşî dest bi karê tenbûrê kir. Di destpêkê de ez û xwişka xwe bûm, dema xwişka min veqetiya, zarokên min sala 1986 dest pê kirin, keça min Fatma û lawê min Jîn...

**B.Botanî:** Hevalê hêja! Stiranên ku hûn distirin yên kê ne?

**Kazim:** Stiranên ku em distirin ji bexçeyên Kurdistanê ne. Pirraniya wan yên mamosteyên gelê Kurd in. Lê karê me yê dawiyê, em yên xwe dibêjin.

**B. Botanî:** Heval Kazim! Hunera we ji bo çi ye?

**Kazim:** Belê, ji bo gelê me ye... Daxwaziya min ew e ku em jî weke gelên cîhanê hunera xwe bigihînin gelê xwe, bi tevayî...

**B. Botanî:** Hevalê delal! Programa we li Ewrûpayê çi ye?

**Kazim:** Em dê li gelek bajarên Ewrûpayê pişikdariya (beşdariya) şevên çandî û civînan bibin. Ew jî li ser xwestina hevalên hunerhez...

**B. Botanî:** Kek Kazim! Plan û programa we piştî gera we ya li Ewrûpayê çi ne?

**Kazim:** Hingê karê me ji bo tomarkirina (tijekirina) kasêtan e û vejandina ahengên (awazên) çandî.

**B. Botanî:** Hevalê xweştivî! Ez dixwazim pirsa dûmahîkê ji we bikim û bêjim ku hûn dê çi ji me re li vê programê pêşkêş bikin?

**Kazim:** Heval em dê du stiranan ji guhdarên hêja re pêşkêş bikin.

**1- Ev warê ha warê me ye, warê me**
**Dê çawa tê j' me bistînî, bistînî**
**Ev warê ha xwîna me ye, xwîna me ye**
**Dê çawa tê me jê derînî, derînî...**

**2- Bablekan Bablekan e**
**Ev cenga karkeran e**
**Deşt û zozan xemilîn**
**Ji xwîna şehîdan e**
**Balafirên dijminan**
**Hêrîş kir ser gelan e**
**Tên kuştin em narevin**
**Boy xaka Kurdistan e...**

**B. Botanî:** Gelek spas! Heval bi kurtî ji me re kada (behsa) vê stiranê bike ka çawa peyda bûye?

**Kazim:** Bablekan, hevalekî pirr hêja bû, li cengê şehîd bû. Koma Şîrwan jî çend gotinên hêja li ser vê şehîdê berhev kir. Heta gelê Kurd hebe, dê behsa wê bike û namire.

**B. Botanî:** Hevalê rêzdar! Li dûmahîkê em gelekî spasiya te dikin!

**Kazim:** Spasxweş!

**Çavpêketin: Hevpeyvîn**

**Şîrwan:** Navê bajarekî li bakura Botan dikeve û Hunermend Kazim ev nav li koma xwe kiriye.

**Têbînî:** Ev çavpêketin hatiye kurtkirin û rastkirin.


## LÎ HEMÛ BAYÎYAN




HEJMARA 17 AN

- JÎ ZÎMANÊ SALÎH MÎRZABEYOĞLU MESELA KURDÎ
- Şerê Kurdistana Bakur
- Nûçeyên Eniya Îbda
- Nûçe ji artêşa Tirk

Navnîşana xwestinê: P.K. 1343/34438 SİRKECİ/İSTANBUL TEL:523 20 40

# Bêdengî şîrikatiya sûc e

*Destpêk rûpel 1*

Îro gelê Kurd bi dengekî bilind û bi biryara bidestxistina azadiya xwe, di meşekî dûr û dirêj de ye. Xaka Kurdistan bi dengê dirûşmeyên law û keçên xwe diheje. Belê singa xwe yê nazik û delal ji , ji şehîdên xwe re vekiriye, wan himbêz dike şehîdên xwe, di axa xwe yê şêrîn û delal de vedişêre û diparêze. Gelê Kurd jî, şehîdên xwe, ji bîr nake û bi tenê nahêle. Di rêça ku şehid vekirîne de, bi îradeyek bilind, bê tîrs û xof meşa xwe didomîne. Ev meş, meşa serxwebûnê ye, Di vê meşê de, cihê li paş mayîn û bêdengiyê tuneye. Lewra bêdengî şirîkatiya tewanê (sucê) ye. Em hemû şehîdên xwe di salvegera şehîdkirina Wedat Aydin de bi bîr tînin û wan pîroz dikin.

Di salvegera bîranîna **Wedat Aydin** de li Diyarbekir û gelek navçeyan, esnaf dikanên xwe girtin. Wekî din dewlet, destûra mitîng û mewlûdê neda.

Ev du roj in jî, 150 kes di operasyonên hêzên dewletê de hatin girtin. Dewlet pêşiya mebûsên HEP'ê jî girt û nehişt bikevin bajêr. Ji heyeta ku bi mebûsan re hatibûn jî, çend kes hatin girtin, di nav wan de serokê HEP'a Bursayê Mûrat Dağdelen û çend rojnamevan hebûn. Ev çend roj in, hêzên ewlekari kuçe, cade û kolanên Diyarbekirê dagîrkirine, ji bajerên der û dor bi hezaran leşker û tîm hanîne Diyarbekir. Ev polis, leşker û tim li xelkê zilm û zordarî dikin. Mebûsên HEP'ê van bûyeran protesto kirin û dest bi greva birçîbûnê kirîn. Mebûsen HEP' ê gera xwe yê ku wê li çend bajarên Kurdistanê bikirana îptal kirin.

**ESNAF DİKANÊN XWE GİRTİN**

Di salvegera şehîdkirina Wedat Aydin de, li Diyarbekir û navçeyên cinar esnaf dikanên xwe girtin. Doh li navenda Diyarbekir, Pasûr(Kulp), Dîcle, Bismil, Licê Çunguş û li navçeyên Mêrdînê, Nisêbîn, Qiziltepe, Dêrik û li Şirnex û navçeyên wê Cizîr û Silopî esnafan dikanên xwe girtin.Ji %90 esnafên Diyarbekir beşdariya vê livbaziyê kirin, şifêran jî mifteyê erebên xwe girtin, otobosên navbajaran nexebitîn. Li silopî tîm tevlî panzêrên xwe ketin nav dikanan û derabeyên wan şikênandin. Li nehiya Bismilê, Selatê jî derabeyên dikanên esnafan hatin şikênandin. Li Melazgira Mûşê jî 1000 esnaf di salve gera kuştina **Wedat Aydin** de dikanên xwe girtin, hêzên dewletê li Melazgir û li Mûşe li xelkê tadeyek giran dikin.

Mebûsên HEP'ê ji bo çapemeniyê civînek çekirin, di daxwiyaniya xwe de tewrê hêzên ewlekarî protesto kirin û wan ji xwîna ku bê rijandin mesûl girtin.

Serokê HEP'ê Feridûn Yazar di axaftina xwe de behsa banga partiyê ku dê civînek li ser mezelê Wedat çêbikirana kir. Wek tê zanîn li ser banga HEP'ê bi hezaran kes li ser mezelê Wedat Aydin civiyabûn û tîm û polîs bi hovîtiyek mezin êrişî wan beşdaran kir û wan belav kir.

# Dewlet bela xwe ji HEP'ê venake

*Destpêk rûpel 1*

bi giştî li ser babeta "Yekparetiya dewleta Tirk e" ya partiyên siyasî jî li ser babeta "divêtiya bikaranîna zimanê tirkî di mitîngan de" ye.

18 mebûsên Kurd yên ku ji SHP ê veqetiyabûn, roja 7'ê Tîrmehê ÖZEP fesix kirin û li gor mercên rojenîn biryar sitandin da ku beşdarê nav HEP'ê bibin.

Dadgehê ji xeynî HEP'ê ji bo girtina SP'ê û RP'ê ji dawe vekir. Di kulîsên siyasî de tê peyivîn ku bi taybetî li ser Kurdan û li ser sosyalîstan pest û zordarî zêde dibe.

Dema di derheqê partiyekê de daweyek tê vekirin ji bo mudafekirinê bi giştî mehek muhlet tê naskirin. Lê li gor Komara Tirk ji ber ku "dosyaya HEP'ê pirr werimî ye" du meh muhlet danê.

**Mahmut Alınak:** Yekîtî ji bo me rûmet e

**Serokê HEP'ê Feridun Yazar:** Emê muxalefeta civakî bilind bikin

8.7.1992 an de ÖZEP xwe fesix kir û derbasî HEP'ê bû.

Mahmut Alınak li ser navê ÖZEP'ê girîngbûna ku derbasî HEP'ê bûn di civînê de anî zimên. "Ji çaxê ku Hikûmet ava bûye ji demokrasî û şefafî yê diaxive, weke benîşt demokrasî û mafê mirovahî di devê xwe de dicû.

Ji ber ku HEP li dijî sîstemê ye, û yekîtiya gelê Tirk û Kurd hwd. dixwaze, dewlet qeraran di derheqa girtina HEP'ê de derdixîn e...

**Feridun Yazar** jî wiha axivî: "Ji ber ku ÖZEP kete nava tifaqa me û di HEP'ê cihê xwe stand ez gelekî şanaz û dilxweş bûm, ev ji bo avakirina demokrasî, mafê mirovahî, wekhevî û biratiya gelê Tirk û Kurd, merhelek gelekî li pêş û zehf rind e. Heger yekîtî û tifaqa mirov hebe tu hêz û qewet nikare mirov bide erdê, belê îro dijmin bi navê demokrasiyê dixwazin ku HEP'ê bigrin, dewlet dixwaze ku bibe kele li devê riya demokrasiyê, heke dewlet HEP'ê bigre, emê 40 HEP'ê din vekin, tu tirsa me nîne û em çavê xwe ji bêmafîtiyê re nagrin. Dibêjin HEP Partiya Kurdan tenê ye, ev gelekî xelet û derew e, tiştekî wisa nîne, HEP Partiya hemû gelên bindest e.

# ROJEVA WELÊT

## Kurm ketine qurmê darê

*Destpêk rûpel 1*

Kurm ketine qurmê wê, maye li ser şax û qaşilan. Hemû sazi û avahiyên wê bi kotek û desteka pîne û naylonan şipya tên sekinandin.

Dema di welatekî dewlemend de karker û gundî birçî bin, memûr û esnaf tazî bin, rewşenbîr û xwendekar di zîndanan de bin, li poxanan bi deh hezaran mirov pars bikin , bi sedhezaran mirov li kuçe û sikakan îşportevanîyê bikin, bi deh hezaran jin ji neçariyê laşê xwe bifroşin, milyonek xort bi darê zorê leşkerî bikin, û li aliyê din hejmareke pirr hindik mirov di nav keyf û sefayê de bi milyaran ji xwe re bileyzin, hingê di wî welatî de jiyan ji bo mirovan heram dibe, tu maneya wê namîne û hedî hêdi hîmê dewleta vî welati dipete û dirize. Ev welat bi xweşbûna xwe ya tabîî wek cenetê be jî, ku tê de tenê hejmarek serdest di nav keyfû sefayê de bijîn, hingê ji bo karker û gundî, memûr û xizanan dibe wek dojehê (cehnem)

Dema li welatekî, bi sed hezaran karker dev ji karê xwe berdan û ketin grevê, bi milyonan memûr, karê xwe sist girtin û dest bi meşên protestoyan kirin, bê hejmar kesên betal û bê kar li pey xerakirina hîmê dewletê geriyan û ji xeynî van, ku bi milyonan gundî serê xwe rakirin û zaroyên xwe şandin serê çiya, û di zîndanan de jî girtiyan li ber xwe dan, wê gavê hîmê dewleta vî welatî tê kolan û qurmê dara wê bi temamî dirize û ji hev dikeve

Dewleta Tirk îro ketiye rewşa dara qurm riziyayî. Heta berî deh salan jî vê dewletê her deh salan carek derbeyeke leşkerî dikir, bi wî awayî kurmên darê diperçiqandin û birîn û qulên xwe pîne dikirin, bes îro şeq û qulên wê hingî fireh û xeder bûne, nema pîne dibin û tên girtin. Ji ber ku dar ji binî ve pûç bûye. Komara Tirk ji destpêka avabûna xwe, ta van salên dawî tu carî neketibû rewşeke welê zor û dijwar. Berê bi darbeyeke leşkerî a cunta di nav çend mehan de çavê hemû kesan ditirsand û dengê gel dibirrî. Ji darbeya dawî û vir de deh sal derbas bûn, pest û zordariya rêveberiya leşkerî li Kurdistanê bi hemû giraniya xwe ve , li Tirkiyê jî bi awayakî nermtir fîîlî domdike, ji çapemaniyê bigrin ta partiyên siyasî , ji tîmên taybetî bigrin ta cerdevanên gundan, ji kontr-gerîla û MİT ê bigrin ta Hizb-î kontra tev bûne yek da ku wek berê dikaribin çavê gel bitirsînin û serî pê bidin tewandin, lê dewlet bi tu awayî nagihîje vê armanca xwe. Ew bi xwe jî dizane ku ev êdî ne mumkun e. Ji ber ku rewş guheriye. Leşkerên dewletê bi xwe jî serî li ber hildidin û firar dikin. Rewş û encamên (şertên) nû hatinê afirandin. Gel şiyar bûye, hînê li hev xwedîderketin û yekîtiyê bûye. Wekî din gerîla roj bi roj hêzên xwe xurtir dikin, karker û memûr bi rewşa xwe baş hisiyane, ji bo ku mafên xwe bistînin, dest didin hevûdin û li dijî dewleta kedxwar dibin yek û serî radikin

Hemû mirovên bindest bi hêviya rojên xweş ber bi tekoşînê ve dimeşin.

Êdî hemû kes baş dibîne ku hîmê vê dewleta zordar hildiweşe. Ji ber ku kurm ketine qurmê dara wê û nema îflah dibe.

# 'Emrê kuştinê..

*Destpêk rûpel 1*

nêzîkî 20-30 kesî mînubusekî sekinandibûn û ji rêwiyên gundê Çalpınar (Şaqil û Sîte) 8 kes kuştibûn 9 kes jî birîndar kiribûn. Radyo û televîzyonên dewletê raya giştî bi vî awayî agahdar kirin "PKK mînubus sekinand û ji gundiyan 8 kes kuştin 9 kes jî birîndar kirin."

Du meh şûn de, derket holê ku ev bûyer ji alî cerdevanên gundê Tinatê (Kutlubey) ve hatiye kirin.

Dozgeriya Komarî ya Midyadê (Midyat Cumhuriyet Savcılığı) li ser sekinî û bi xwe çû cihê bûyerê. Dozger ji hêzên ewlekariya dewletê xwest ku qalikên fişekan bidin hev û jê re bînin bes hêzên leşkerî ev daxwaz ne anîn cih. Dozger bi xwe qalikên vala dan hev. Waliyê Mêrdînê Yahya Gür, qalikên fişeka û çekên cerdevanan tevî hev şandin laboratuara polîsan ya Amedê ji bo lêkolîna balîstîkî. Du meh li ser van 66 qalik û 28 çekan lêkolîn çêbûn, di dawiyê de xuya bû ku ev qirkirin bi van çekên cerdevanan çêbûye. Divê navê de berpirsiyarên leşkerî di daxuyaniyên xwe de dixwestin nîşan bidin ku wê gavê cerdevanên gundê Tinatê ne li cihê bûyerê bûn!

Ji bo vê qirkirinê di 19'ê Nîsana 1992 an de serbazê qereqola Tinatê û cerdevanên gund, li hev civiyan û peşk kişandin (qure kişandin.) Di dawiyê de cerdevan Cengiz Kaçmaz, İsmail Taş û zilamên wan tevî hev ev qirkirin çêkirin. Ji gundê Tinatê cedrevanekî din, dîtin û nêrînên xwe wiha anî zimên. "Cengiz Kaçmaz û İsmail Taş sercerdevanên (korucubaşı) gundê me ne. Gelek caran serdarê Komando (Komando Binbaşı) bi helîkopterê dihate gundê me û ew herdu mirov dibirin û diçûn. Carna bi rojan ne dihatin gund. Gava vedigeriyan jî por û simbêlên wan jêkirî bûn!

Ev nîşan dide ku bi leşkeran re li dijî gerîla şer dikin. 19'ê Nîsanê em tevî hev 28 cerdevan û serbazên qereqolê li hev civiyan û peşk hate kişandin. Di dawiyê de diyar bû ku Cengiz Kaçmaz, İsmail Taş û tevî cerdevanên din ev qirkirin çêbikin."

Sercerdevan Cengiz Kaçmaz bi devê xwe ev gotin îtîraf kirin: "Min bi xwe planê vê bûyerê çêkir, emrê kuştina wan jî min da."

# Şerê psîkolo..

**Destpêk rûpel 1**

xwe ji bo jiyaneke nû û azad amade dikin, têkiliyên xwe û gerîla roj bi roj xurttir û germtir dikin.

1-7-1992: Gerîla li ser riya Bedlîs û Xîzanê ereban da sekinandin û nêzîkî 2 saetan propaganda kirin. Di kontrola rêwiyan de 10 cerdevan hatin tespîtkirin. Gerîla van cerdevanan kuştin.

-Li Mergeh (Şirnex) gerîla êrîş birin ser qereqola leşkeran. 10 leşker û gerîlayek di vî êrîşî de mirin, 20 leşker û 2 gerîla jî birîndar bûn. Li gor daxwiyaniya gerîla, ev qereqol bi navê "Tabûra Hahuski" dihate naskirin, di mewziyan de 60 leşker hebûn, di vî êrîşî de 13 mewzî hatin hilweşandin û gelek leşker jî mirin. Gerîla, 2MG3, 1BX û gelek malzemeyên leşkerî jî bi dest xistin.

2-7-1992: Gerîlayên PKK'ê li navçeya Wanê Çaldiran bi ser gundên Gulejorî û Gule jêrî ve girtin. Ev herdu gundên cîran yên cerdevanan in. Gerîla berî ku bikevin van gundan, li çarmedorên wan mayin radixin, dû re êrîşî ser malên cerdevanan dikin. Di vî êrîşî de 12 cerdevan û 4 leşker tên kuştin, 25 kes jî birîndar dibin. Helîkopterek jî tê îmhakirin.

-Gerîla li Hekariyê êrîşek xurt bir ser saziyên dewletê, ev êrîş 3 saet domand, kuştin û birîndarî çênebûn.

-Qereqolek li nêzî Çolemêrgê ji alî gerîla ve hate texrîpkirin, erebeyek leşkerî jî îmha bû. Kuştî û birîndar nînin. Li ser vê bûyerê li Hekariyê gelek girtin çêbûn. Dewlet navên girtiyan vedişêre.

Li Midyadê gundiyek 55 salî di nav zeviyê xwe de ji teref leşkeran ve hate kuştin. Süleyman Başar bavê 10 zarokan bû û wî di televîzyonê de "terorîst" îlan kirin.

3-7-1992: Li Nisêbînê, ji bo protestokirina girtin û binçavkirina 2000 gundiyan esnafên Nisêbînê dikanên xwe girtin. Hêzên dewletê ji van esnafan 20 kesan girtin û wan tehdît kirin.

-Qereqolla Şkeftiya (Şirnex) ji teref gerîla ve hate hilweşandin.di vî êrîşa gerîlla de 2 serbaz û 8 leşker hatin kuştin.

-Li Dêrsim navçeya Mazgirtê 3 leşker hatin birîndarkirin.

-Li Qers Qaxizmanê Cerdevanek hate kuştin, yek jî birîndar bû.

-Li Varto (Mûş) û Şîrwanê 2 muxbîr hatin kuştin.

-Şerê li gundên Wanê, Gulejorî û Gulejêrî li çiyayê Tendurek dom dike. Doh jî 5 leşker hatin kuştin, gerîlayek jî di vî şerî de mir.

-Kontra êrîşên xwe yên li hember welatparêzên Kurd didomînin. Li Batmanê Hüseyin Uğuç ji teref kontrayan ve hate kuştin. Li Qiziltepe jî Vedat Doğan birîndar bû, yê ku êrîş bir ser Wedak, bi navê xwe Mehmet Denli, ji teref xelkê ve bi çekan hate birîndarkirin.

4-7-1992: Li Meraşê 3 gerîla piştî şerekî dirêj hatin kuştin, ji zayîatên leşkeran nûçe ne gihane destê me.

-Di salvegera şehîdkirina Wedat Aydin de, li Diyarbekir panelek çê bû. Mebûsên HEP'ê Ali Yiğit, Hatîb Dîcle, Sedat Yurttaş û sekreterê giştî yê HEP'ê Ahmet Karataş beşdarê panelê bûn. Panel bi axaftina serokê HEP a Diyarbekirê Hüseyîn Turhallı vebû. Ahmet Karataş, Ali Yiğit û Hatib Dicle jî axaftin kirin. Nêzîkî 600 kes beşdariya panelê kiribûn. Wekî din, di salvegera şehîdbûna Wedat Aydin yê yekemîn de, esnafên Erxanî dikanên xwe girtin.

6-7-1992: Li Başqaleyê (Wan) cerdevanekî hate kuştin, 2 jî, ji alî gerîla ve dîl hatin girtin.

-Li Pasûrê (Kulp) 2 zarok ji alî leşkerek ve hatin gulebarankirin. Yek ji van zarokan (Çiğdem Esmer-10 salî) ji laşê wê 7 gulle derxistin û li gor doktoran birîndariya wê gelek giran e.

# Terora dewletê...

*Destpêk rûpel 1*

Ji Kurdan keçan ji xwe re nekin jin, hûn jî keçên xwe ji Kurda re nekin bermalî." Avahiyên ku Kurd têde dijîn kolîtvan (gecekondu) bi destûrê Mudûrê Emniyeta giştî ê Îzmîrê, Reîsê Belediyê û Waliyê İzmîrê tev xira kirin, dezgehê karkerên Kurdan tev di bin lingan de perçiqandin. Dewlet zorbaziya (terora) xwe êdî ne li Kurdistanê tenê, vêca li ser Kurdên metropolê jî bi kar tîne.

Li metropolan girîng e ku Kurd qomîta di nava xwe de ava bikin û li hev bibin xwedî, li hemberî van konevaniyên dewletê pêwist e ku hev bigrin û biparêzin.

Li hemberî vî şerê taybetî tifaq, yekîtî û dengê Kurdan tenê nebes e, ev pirsgirêk ne ya Kurdên metropolê tenê ye, ev pirsgirêk a hemû mirovên demokratên Tirk, Kurd û hwd. e û divê ku li hemberî vê nîjadperestî tovê neyartiye derkev in...

*Ş. Arjen*

# Dîcle Hesenkeyfê nexeniqîne

**• Li ser rûyê dinyayê pevçûn û nakokiyên mirovahiyê roj bi roj zêde dibin. Ji aliyekî ve em dinerin ji bo xelaskirina çend balînayan dinya giş dengê xwe bilind dike û dibe seferber, ji aliyekî din ve vêca em dinerin dema ku kevnebajarekî dergûşa mirovahiyê Hesenkeyf di bin avê de dimîne û wêran dibe, dîsa eynî ev dinya çavê xwe digre û guhê xwe kerr dike.**

**Murat Ergin**

Li dergûşa bajarvaniyê Mezopotamya dîrokek di bin avê de heba dibe. Herçiqas av ji bo hemû jîndaran çavkaniyeke bingehîn be jî, îro di destê mirovên "hemdem" de wek pergaleke ji holê rakirina berhemên dîrokê tê bi kar anîn. Hesenkeyf (Eskîfê) li gor hinek arkeologan kevnebajarê herî kevnê mirovahiyê ye, yanê berî hemû deveran mirov li Hesenkeyf cihwar bûne. Lê mixabin îro ev kevnebajar li hêviyê ye ku di bin avê di bimîne û winda bibe. Xuya ye Hesenkeyf jî dibîne ku mirovahî îro di demeke pirr dramatîk re derbas dibe û di rewşeke gelek dijwar de ye.

Hesenkeyf baş dibîne ku îro hejmarek kedxwar da ku çend doləran zêde kar bikin welatan dagîr dikin, xwîna bi milyonan însanan dimijin. Li Kurdistanê girsên gel tên qirkirin, ji ber vê yekê, ji ber vê rewşa dijwar a ku mirov tê de bi perîşanî dijîn, Hesenkeyf şerm dike bala mirovahiyê zêde bikişîne ser xwe û li xwe danayne alîkariyê bixwaze.

Armanca dewleta Tirk, bi cenga xwe ya qirêj a ku li Kurdistanê didomîne ne tenê ji holê rakirina hebûna Kurdistan a leşkerî, aborî, siyasî û civakî ye, ji holê rakirina dîrok û bajarvaniya gelê Kurd jî armanca vê dewletê ye. Berhemên dîrokî yên li Kurdistanê hatine parastin û gihîştine heta îro, ji hêla dagîrkeran ve êdî, an ji cihên xwe yên berê tên dûrxistin, li bajarên metropolê tên raxistin û firotin an jî ev berhemên bêhempa di cihên xwe de tên hilweşandin û wêran kirin. Hesenkeyf jî, yek ji wan kevnebajaran e ku Komara Tirkiyê dixwaze wêran bike. Lê piştî vê yekê jî dewlet çawa ku tiştekî baş dike navê vê wêrankirina bajarvaniyê daniye "di nav çarçovê projeya GAP ê (Projeya Ênedola Başûrê Rojhilat) de başkirina aboriya herêma Kurd."

Dîroka Hesenkeyf ji dema kevnare ve dest pê dike. Herçiqas tarîxa avabûna wê baş neyê zanîn jî, li gor lêgerîn û lêkolînên hatine kirin, derketiye holê ku Hesenkeyf yek ji navendên cihwarbûnên herî kevn ên dinyayê ye.


Hesenkeyf ji Batmanê 20 km dûr e, ku mirov ji Batmanê bi otomobîlekî dikeve rê di nav 20 deqîqeyan de xwe di nav bermayên dîrokeke 5000 sal kevin de dibîne. Ev bajarê ku tam li keviya çemê Dîcle hatiye avakirin ji aliyê Kurdê Kayfa ve wek "Eskîfê" hatiye bi nav bikin. Navê "Hisnî Keyfa" jî cara pêşî ji aliyê Suryaniyan ve lê hatiye kirin.


Li Hesenkeyfê dewsên gelek bajarvaniyan ber çavên mirov dikevin. Bîzansî, Asûrî, Romayî, Artûkî, Eyûbî, Merwanî û hejmarek bajarvaniyên din Hesenkeyf wek navenda ticarî û rêveberiyê bi kar anîne. Di serdema Romayiyan de ev der wek wargehek (qonaxek) hatiye bi kar anîn. Ji ber ku ev der ji bo li berxwedan û xweparastinê wargeheke berbihev (musaît) bû.

Li Hesenkeyfê biçûk an jî mezin nêzîkî 5000 şikeft hene. Ev şikeft, hinek ji wan di serdemên berî-dîrokê hinek ji wan jî di serdemên dîroka ku tê zanîn de, di zinarên nerm de hatine çêkirin. Ev şikeftên dîrokî yên ku heta salên 60 an jî di wan de dihate rûniştin wek xaniyên adetî ne, yanê wek malên adetî hem salon, hem menzel (ode) hem jî metbexên wan hene.



*Dîroka Hesenkeyf ji dema kevnare ve dest pê dike. Hesenkeyf yek ji navendên cihwarbûnên herî kevn ên dinyayê ye.*





Tam li navenda Hesenkeyfa kevin, du girên bilind ên li rû hev hene. Li ser yekî ji wan qesrek, li ser yê din jî darpxaneyek hatiye avakirin. Li derdora qesrê jî keleheke bi heybet hatiye çêkirin.

Bi taybetî deriyên vê kelehê bêhempa bûn. Ev deriyên ku hemû pisporî û zerafeta hostetiya keviran di xwe de diyar dikin, li kêm derên dinyayê tên dîtin. Lê mixabin îro ji wan deriyên navdar yek bi tenê li ser xwe maye.

Pira ku çend sed metre ji deriyên kelehê dûr û li ser çemê Dîcle ne kifş e ji hêla kê ve hatiye çêkirin, îro maye tenê bi sê piyan. Li ser piyekî vê pirê fîgurek (şiklek) ku ji teref xiristiyanan ve hatiye xêzkirin heye.

Ji xeynî van, li Hesenkeyfê wek berhemên dîrokî Tirba Zeynel Abidîn, Mizgefta Beran, Mizgefta Silêman, Medrese û du heb minareyên dirêj hatine parastin û gihîştine heta îro.

Ev kevnebajarê ku çemê Dîcle wî wek gerdaniyeke şîn dixemilîne, van rojan bi kul û keser li hêviyê ye ku di bin avê de winda bibe. Hesenkeyf li hêviya temambûna avbenda (baraja) ILISU ye. Ev avbend li nêzîkî Cizîrê tê înşa kirin û di nava pênc salan de wê bikeve faaliyetê.

Li gor rêvebirên Tirk ên ku li Hesenkeyfê xebatên xwe yên arkeolojîk didomînin, heta sala 1997 an tenê dê bikaribin çend berhem û avahiyên vî kevnebajarî ji bin ava avbenda ILISU xelas bikin.

Ji xwe heta niha, ji bo xelaskirina vî bajarê kevnare ji xebatên Belediya Hesenkeyfê ku bi navê kampanyaya "Em Hesenkeyfê xelaskin" dest pêkiriye pêştir, tu xebatên din ên ji dil nehatine kirin. Ev kampanya Belediyê jî êdî zehf hêviya xwe bi alîkariyên sazî û komeleyên navneteweyî ve girêdaye da ku Hesenkeyfê xelas bikin. Wekî din Unesko jî bi awayekî zêde ne ji dil, pariyekî li ser vê pirsê disekine.

Her çiqas bi pêşveçûn û dorfirehbûna têkoşîna gelê Kurd re Hesenkeyf ji bo pêşerojê dibe xwedî hêviyeke mezin jî, derheqê vê meselê de bê eleqedarî û xwekerrkirina mirovahiyê wî şaş dihêle û xemgîn dike.

Li ser rûyê dinyayê pevçûn û nakokiyên mirovahiyê roj bi roj zêde dibin. Ji aliyekî ve em dinerin ji bo xelaskirina çend balînayan (masiyên metin û hût) dinya giş dengê xwe bilind dike û dibe seferber, ji aliyekî din ve vêca em dinerin dema ku kevnebajarekî dergûşa mirovahiyê Hesenkeyf di bin avê de dimîne û wêran dibe dîsa eynî ev dinya çavê xwe digre û guhê xwe kerr dike.

Ji ber vê yekê, gelo wê kî ji cidiyeta konferansa derheqê parastina xwezayê de ku bi propagandayeke dorfireh li Rio hat çêkirin bawerbike? Wisa xuya dike ku mirovahiya dinyayê jî, wê bibe beşdar û hevparê sucê (tewanê) mirovahiyê ku Komara Tirkiyê li Hesenkeyf pêktîne.

welat

• Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezgahê (Müessese Müdürü) Zübeyir Çakır • Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat • Navnîşan (Adres): Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D. 4 • Cağaloğlu / İstanbul •Tel:511 57 60 - 511 66 02 • Fax: 511 51 57 • Berpirsiyariya a Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715 • Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ